kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

HAVÎN 2002

17

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

TIDSKRIFTEN UTKOMMER 4 NUMMER PER ÅR.
SÊ MEHAN CARÊ DERDIKEVE/ÜÇ AYDA BIR ÇIKAR.

UTGES AV APEC-FÖRLAG AB

HEJMAR 17, HAVÎN 2002

ANSVARIG UTGIVARE
Ali Çiftçi

REDAKSIYON
A. Çiftçi, B. Darı, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M.Bayrak, Î. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

ADRESS
NAVNÎŞANA LI SWÊDÊ
Box: 8121, SE 163 08, Salagatan 20 Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-POST
info@birnebun.com

INTERNET
www.birnebun.com

NAVNÎŞANA LI ALMANYAYÊ:
M. Özgür
Bîrnebûn Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya
Telefaks: 0049-(0)2203-301630

BIHA/FIYATI:
Europa: 5 Euro • Türkiye: 2 500 000 TL.
(Bu fiyat eski dergiler içinde geçerlidir)

ABONE (2 yıllık bedeli):
İsveç: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

TÜRKIYE BANKA HESAP NUMARASı:
F. Yıldız Vakıf Bank Polatlı Şubesi
Hesap No: 00158001 445398272

İSVEÇ HESAP NUMARASI:
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

ALMANYA HESAP NUMARASI:
M. Özgür, Stichwort "Bîrnebûn" Deutsche Bank-Köln
Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

BELAVKIRIN / DAĞITIM
Türkiye: Toplum Kitabevi / Remzi İnanç
Bayındır sok. 22/1, 0642 Yenişehir /**Ankara**
Tel: 0312/434 25 43

Medya Kitapevi/Selahattin Bulut
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasajı No: 258/6 Beyoğlu-**İstanbul**

HOLLANDA
Neçîrvan Qilorî
Tel: 0031-62 4663655

ÇAP / BASKI
Apec-Tryck AB

Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye. Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî, li xwedî nayên vegerandin.

www.arsiv.org

Naverok / İçindekiler

Nivîsên bi kurdî

Ji Bîrnebûnê 2
Du rojên kulturi yên kurdên Anatoliya Navîn li Fittjayê 4
Fehmiyê Bîlal *(Sekreterê Şêx seîd)* 13
Klîma û ziman 18
Îda Qurbanê - Qurbana serjêkirin 20
Tirsa Gulcanê 24
Bêrîvan 27
Ûsivê Mihecir -II, 28
Hevpeyvînek bi kevneserokê Belediya Omera, Mistik Barlas re 34
Çarîn ji hêla Sarizê 36
Kurtejiyana min-III, 9
Heykî Heykî 45
Ma gur biçe loqantê 48
Gûlîzer 50
Kê got kê negot 54
Helbest 55
Folklor 56

Türkçe Yazılar

Avrupa Konseyi'nın, Kültürel Haklarla.... 61
Atatürk, Orta Anadolu ve Kelhasanlı Abbas 67
Kuşaklar değişiminde Orta Anadolu Kürtleri 70
Reşwaniler Üzerine Rapor 74
Reşvaniler Üzerine Rapor'un Orjinali 81
Kopenhag Kriterleri 87
Anket 89
Köyümüzü, Kasabamızı Nasıl Tanıtabiliriz? 93



www.arsivkurdi.org

JÎ BÎRNEBÛNÊ

Ali Çiftçi

Xwendevanên giranbiha!

Ev hejmara di germa havînê de hat hazir kirin. Havîna îsal bi taybetî, li welatên Ewropa pir germ derbas bû. Ji ber hewa germ li navçê Ewropayê baran gelek barîn û çend bajarên wek Pragê yên dîrokî, di bin avê de man. Welatên Skandînavyayê piştî zêdeyî 50 salî havînek wiha germ didîtin. Rewşa hewayê li gor lêkolînên di wî warî de hene, nişan didin ku 3 derece hewa bi giştî germtir bûye. Li welat jî germa havînê, wek her sal ji bo hinekan dilşahî û ji bo hinekan jî dilşewatî bû.

Piraniya însanên me yên Anatoliya Navîn ji ber bê îstikrariya rejima Tirkiyê derketine derveyî welêt, li welatên Ewropa bi cîh bûne. Lê wan ti bendê xwe ji welêt nebirîne. Her sal di mehên havînê de terin îznê, meriv û xismên xwe dibînin, hesretên xwe yên bi salan li ser xwe davîn, dilê wan bi hev şa dibe û bi dilekî rihet vedigerin ser îş û karên xwe. Lê ji bo hinekan jî ev mehên havînan dibe dilşewatî û malwêranî! Hinek bi xeberên xweş û dilekî rihet, hinek jî bi dilşewatî vedigerin.

Ew 22 sal in ku ez bi xwe li xerîbiyê dimêm. Hetanî niha min havînek bê xeberê reş, derbas nekiriye. Her sal, yan bi qeza trafîqê yan bi nexwaşiya dil însan çûne ser dilowaniya xwe.

Di vê havînê de min jî du hevalên xwe yên hêja wenda kir. Neco (Necati Pekerman) ji gundê Korkmazlara û Beko (Bekir Çakmak) ji Kelhesen li dû hev, ji ber ew germa havînê, ji nexwaşiya dil çûn rehmetê. Herdû jî însanên di mesela netevî de têgîhiştî û welatparêz bûn. Em li vir ji malbata Beko û Neco re dibên serê we sax be! Ew du însanên ku ji bo Kurd û Kurdistanê fedakar bûn, dê her tim di dilê me de bin.

XWENDEVANÊN HÊJA, dema ew hejmara ji bo çapê dihat hazir dikirin, bûyerên balkêş, hem li welêt û hem jî li derveyî welêt çê dibûn. Amerika ji bo ku li rejîma İraqê xe, di haziriyeka berfireh de ye. Trafika xwe ya welatên rojhilat û muhalîfên İraqê zêde dike. Amerika dîsa dixwaze ji bo ku alîgirên xwe zêde bike, mesela kurda li navçê bi kar bîne!

Xuyaye kurd êdî, ne kurdên sed an dused salî berê ne. Kurdan jî hêdî politika dinyayê fêm kirine û xwedî tercûbên giranbiha nin. Kurdan heta niha bedelên pir mezin dane. Divê hêdî zû bi zû neyên lîstikên politikayên rojane. Di pêşerojê de buyerên pir muhîm dikarin li Kurdistana Başûr biqevimin. Divê hemû însanên me yên kurd hişyar bin. Hetanî niha destkevtiyên ku li Başûr çêbûne, bên parastin û berfireh kirin.

Rewşa kurdan ya îro dîsa di kunjûktura dinyayê de baş nayê xûya kirin. Divê kurd di her aliyî de çav vekirî bin!

Li bakûrê welêt û Tirkiyê jî gelek dek û dolab ji aliyê tirkan ve têne kirin. Tirkiye ji bo ku rewşa xwe ya aborî serrast bike, tenê çarê di endametiya Ewropayê de dibîne. Ji bo ku bikaribe xwe nêzî Ewropayê jî bike, divê di mesela demokrasiyê û mafên însanan de hinek be jî, gav bavêje û ji bo wê yekê jî di meha Temûsê

www.arsivakurd.org

Divê em vê yekê baş bizanibin; dema di rewşên wiha de, em wek netew xwedî plan û programên yekgirtî bin, dek û dolabên tirka, îcar dê vala derkevin.

de meclisa tirka, TBMM li ser vê meselê, ji bo di kanûnên xwe de hinek guhartina bikin, çend biryar girtin. Di nav wan biryarande mesela demokrasiyê û serbestbûna zimanê kurdî jî, heye. Heta niha tirkan di masmedya xwe de ew biryara pir mezin kirin. Hineka wek şoreşeka mezin bi nav kirin.

Lê ya rast ti guhartinek mezin nîne. Hîn jî zimanê kurdî bi resmî naynin ser lêvên xwe. Tirkiye dixwaze rûyê xwe yê qirêj paqij bike ku bikaribe here tev cemaata Ewropayê bibe. Bi rûye paqij derketina nav cemaatê helbet tiştekî rind e. Divê dest û rûyên xwe bi aveka paqij şûştî bin, dakû bihna paqijiyê lê were. Xûya ye, Tirkiye bi rastî dixwaze dest û rûyên xwe bişo, lê ne bi aveka paqij, bi aveka genî dişo û ji ber wê yekê jî bihna qirêj hîn lê tê. Ji bo vê jî dê nikaribe di nav cemaata ku dixwaze tevê bibe, ji xwe re cîh bibîne!

Li ser endametiya Yekîtiya Ewropayê û mafên mînoriteyan komîsyona YE yê ya ji bo mafên mînorîteyan, hinek biryar stendibûn. Ji ber aktualiya mijarê me di vê hejmarê de nivîsa birêz Kemal Uzun ya bi sernivîsa *Avrupa Konseyi'nin, Kültürel Halklarla İlgili Yaptığı, İki Önemli Sözleşme* û herwiha Krîterên Kobenhangê, *Kopenhag Kriterleri* jî bi zimanê tirkî weşand. Bi hêviya ku dê ji bo rojeva ku niha li Tirkiyê, bi taybetî li ser mesela perwerdeya bi zimanê kurdî ku tê munaqeşe kirin, bibe alîkar. Divê, em wek kurd di vê meselê de xwedî daxwaz û programên pir ber biçav bin. Gelo, ew tiştên ku niha li Tirkiyê têne rojevê, ji bo me kurdan têne çi maneyê? Divê her kurdek vê pirsê li xwe bike û li gor vê tevî rojevê be! Her malbatek, gundek, belediyek, partiyek û rêxistinên kurda divê pir vekirî daxwaza mafê xwe yê kulturî û bi zimanê kurdî perwerdeya zarokên xwe li gor biryarên Yekîtiya Mîletan (YM) û Yêkîtiya Ewropayê (YE) li Tirkiyê daxwaz bikin, daku ev ji rojevê nekeve.

Dereng be jî, divê hemû rêxistinên kurda; çi yên siyasî û çi jî yên sîvîl bin, bêyî ku li çûk û meziniya hev binêrin, werin bav hev, li ser wê meselê dîtinên hev guhdarî bikin, dakû diyalogek çêbe!

Bêdengî, bê plan û program dê zerara kurdan be. Divê em vê yekê baş bizanibin; dema di rewşên wiha de em wek netew xwedî plan û programên yekgirtî bin, dek û dolabên tirka, îcar dê vala derkevin. Rewşa kurdan ya îro di konjûktura dinyayê de wek her gav dîsa tenik e, lê kurdên îro li gor do hindik be jî xwedî tercûbe û îmkanên mezin in. Îroj her çiqas bi kêmasî bin jî, kurd xwediyê masmedyayeke rojane ne. Ev yeka tiştekî biçûk nîne! Tenê divê em bigihên hev û berî dijmin divê em destên hev bigrin û xwedî biryarbûna xwe hem bo dostên xwe û hem jî bo dijminên xwe pir vekirî nişan bidin. Tiştê ku îro ji kurdan tê xwastin ev e!

Heta hejmareka din di xêr û xwaşiyê de bimînin!

www.arsivkurdi.org

Ali Çiftçi

Du rojên kulturi yên kurdên Anatoliya Navîn li Fittjayê

Li Stockholmê, li taxa Fittjajê piraniya rûniştvanên ku li wir dijîn ji kurdên Anatoliya Navîn in. Bi vê munasebetê di daviya payîza 2001ê de bi bêşniyaziya kovara Bîrnebûnê, li lokala Mångkulturellt centrumê, li Fittjayê, bi mesûlên Mångkulturellt centrum, Södertörns Högskola, mamostên zimanê kurdi li Fittjayê, çend keçên kurd ku li dibistanên bilind dixwînin û jînên kurd ku li belediya Botkyrkayê rûdinin ve civînek pêk hatibû. Di vê civînê de biryara ku du rojên kurdî yên kulturî li taxa Fittjayê bêt kirin hatibû girtin.

"Piraniya însanên li dinê duzimanî yan jî pirzimanî ne. Ew hem ji bo meriv bi xwe û hem jî, ji bo civatê tiştekî pir bi qîmet e."

Di payîza 2001ê de didu û di bihara 2002an de jî pênç civîn li ser vê meselê hatibûn kirin. Di her civînekê de 12-15 kes beşdar dibûn. Ew civînana hem ji bo ku organîza ev herdû rojan bên kirin û hem jî, ji bo ku ew kesên ku di civînan de beşdar dibûn hevdû ji nêz de nas bikin, dihatin kirin. Di van civînan de, li ser pêwistiya semîner û danasîna Kurdên Anatoliya Navîn dihat qise kirin. Di dawiya van civînan de hemû di mesela armanca projê de hemfikir bûn.

Armanca van rojên kulturî; pêşxistina kesayetî, xwebawerî û xwenasîna Kurdên Anatoliya Navîn bû. Li gor vê armancê jî programek hat qebul kirin û kar hat belav kirin. Çar grubên kar hatin çêkirin.

1. Gruba seminera zimên.
2. Gruba ciwana.
3. Gruba aktîvîte ji bo zarokan.
4. Gruba şeva şahiyê.

Kovara Bîrnebûnê jî dê li ser kurdên Anatoliya Navîn yên li Swêdê hejmareka taybetî bi swêdî û kurdî amede bikira.

Rojnameya herêmî ya bi navê *Mitt i Botkyrka*yê jî bi ferehî li ser ev herdû rojana sekinî. Di rojnamê de li ser girîngiya wê xebatê bi Hatice Demirci re hevpeyvînek dirêj çêkir û du roj berî aktîvîtan weşandin. Di rojnamê de hatibû nivîsandin ku çara yekem e, kurdên Anatoliya Navîn rojên kulturî çêdikin.

Semînera li ser ziman ji bo mamostan, di roja 3ê Gulanê li dibistana Fittjaängsskolanê, bi beşdariya nêzikî 40 kesan ve hat kirin. Semînerdar KARI FRAURUD bû. KARI FRAURUD yek ji van expertên zimannasiyê û dûzimaniyê ye. Wek lêkolînvan li Universita Stockholmê kar dike. KARI FRAURUD bi giranî li ser zimanê ku li ma-

www.arsivkurd.org

Vikten av att kunna

SPRÅKET

Ge inte upp!
Kämpa med språket!
Det budskapet vill Hatice Demirci ge de kurdiska skolbarnen i Fitlja.
Hon är en av få anatoliska kurder som har läst vidare.
På fredag och lördag är det kurdiska kulturdagar.
Då ska Hatice berätta om sin språkliga resa.

Med andan i halsen

Det är synd att det inte bor fler svenskar i Fitlja, säger Hatice Demirci som under de första åren i Sverige bodde i Brandbergen. "Där fanns det många svenskar i skolan och därför gick det lättare att lära sig svenska."

Hevpeyvînek bi Hatice Demirci re. Ji *Mitt i Botkyrka* (30/04/2002),

lê tê qisekirin (zimanê dê û bavê) sekinî. Di pêşketina kesayetiya zarokan de girîngiya zimanê dê û bavan anî rojevê. Herwiha di hînbûna zimanê diduyan de jî dîsa zimanê malê çiqas muhîm e, bi mînakan li ser sekinî. Di navbera semînerê de carcar pirsên ku dihatin jî, bi nimûneyên ji tercûbên xwe bersiv dida.

Beşdarên semînerê hem mamostên zimanê kurdî û hem jî yên swêdî bûn. Ji derveyî mamostan, kurdên ji belediya Botkyrkayê jî beşdar bibûn. Di dawiya semînerê de gotûbêjên germ çêbûn. Hinek ji beşdaran serpêhatî û tercûbên xwe gotin. Ew beşa yekê ya semînerê bi gotûbêjên germ qediya.

Beşa duyem jî dîsa li ser duzimanî, lê ji bo dêûbavan bû. Ji ber semînerê pir bala beşdaran kişand, piraniya beşdarên beşa yekê ji bo beşa diduyan jî sekinîn. Bi xêra wan dîsa hejmara beşdarên beşa diduyan jî, kêmî 30 kesî nebûn.

Mala dê û bavan ava be, bi beşdariya dêyeka tenê me dest bi beşa diduyan jî kir. Tiştekî dîn yê balkêş jî ew bû, ku qesî 15-20 şagird beşdariya semînerê bûn û bi

Ji civîna gruba ciwanan, li dibistana Fittjaängsskolanê bi şagirdên kurd re.

aramî guhdariya gotûbêjan kirin. Carcar bi xwe jî tevî gotûbêjan dibûn.

Ew dêya ku hat, bi pirsên muhîm tevî gotûbêjan bû. Yek ji pirsên wê;

– Ez her bi kurdî zarokê xwe re qise dikim, lê ew bi swêdî bersiva min dide û carcaran jî kurdiya min têrê nake û ez bersiva zarokê xwe bi kurdî bidim. Dema zimanê min têrê neke ma ez divê çi bikim?

Li ser vê pirsê gotûbêjên pir germ û geş çêbûn. Hinek ji beşdaran digotin; divê meriv siftê bi zimanê ku meriv baş dizane (qesta wan zimanê swêdî bû) bi zarokê xwe re qise bike daku zarok bikaribe di dibistanê de bi serkeve.

Hinekan jî digotin; na, divê meriv tenê bi zimanê dê û bavê yanê bi zimanê malê qise bike. Dema zarok zimanê xwe yî dê baş fêr bibe ew dikare zimanê diduyan û sesêyan jî hîn hêsantir fêr bibe. Di wî zarokî/ê de hisên kurdîtî çêdibin. Ew sibê bi rihetî dikare muzika xwe bi kurdî guhdar bike, kultur û folklora xwe hîn baştir fêm bike. Dema ew zarok kultur, ziman û keseyatiya xwe baş zanî dikare bi rihetî zimanên din jî rind fêr bibe. Gotûbêj bi dîtinên wiha yên cihê cîhe berdewam bûn.

Bersiva semînerdarê ji bo pirsa ew dêya ev bû: ***Divê wek dê tu her bi zimanê xwe bersiva zarokê xwe bide. Ji bo zarok ya herî girîng ew e, ku kodên zimanê xwe baş bizanibe.***

Hinek ji beşdaran ji mesela kurdiya Kurdisanê û kurdiya Anatoliya Navîn anîn holê. Hinek ji şagirdan digotin ku em kurdiya resmî (rikskurdiska) baş nizanin. Li ser vê dîtinê mamostên zimanê kurdî ditinên xwe anîn ziman û gotin ku kurdiyeke

www.arsivakurdi.org

Dîmenek ji semînera zimên.

resmî (rikskurdiska ku şagirdan bi lêv dikirin) tuneye. Bilakîs kurdiya ku kurdên Anatoliya Navîn qise dikin, kurdiyeke pir paqij û gelek gotinên orjinal yên kurdi hene. Erê, di kurmanciya kurdên Anatoliya Navîn de gelek gotinên tirkî hene. Lê, ew nayê wê manê ku kurdiya kurdên Anatoliya Navîn ne rast e. Dema meriv ew gotinên tirkî ku ketine nav kurdiya kurdên Anatoliya Navîn derxîne û di şûna wan de gotinên kurdî bi karbîne, ev dem tu ferqiyeke mezin di navbeyna kurdiya Kurdistanê û kurdiya Anatoliya Navîn de namîne. Lê mixabin, îro li piraniya bajarên Kurdistanê yên li beşa Tirkiyê jî, gelek gotinên tirkî bi kar tînin. Heta ku ziman di resmiyetê de wek zimanekî perwerdê neyê bikar anîn ew problemana dê her hebin.

Hemû mamostên zimanê kurdî ku beşdarê civînê bibûn, di vê meselê de hemfikirbûn.

"Cara yekem e, ku ez hewqas zarokên kurda bi hev re dibînim. Hemû jî bi kurdî dizanin û ez jî îro li vir, bi wan re tenê bi kurdî qise dikim û ders didim. Ew ji bo min tiştekî pir mezin e!..."

Dîmenek ji aktîvîteya zarokan, li Fittjayê.

www.arsivakurdi.org





Çend dîmen ji aktîvîteyên zarokan, li Fittjayê.

Ji berhemên zarokan çend wêne.

Dîmenek ji govenda xatûnên li Fittjayê di şeva şahiyê de.

Gruba ciwana jî d i eynê rojê de li dibistana Fittjaängsskolanê ciwanên kurd berhevkribûn û bi wan re li ser rewşa dibistanê û xwendinê sohbet kirin. Du keçên kurd ku li universîtê dixwînin, bi şagirdên 12-16 salî re li ser girîngiya xwendinê û tercûbên xwe semîner dan. Bi wan re li ser pirsgirekên ciwanan sohbet kirin.

Di civînên ciwanan de jî di navbera 40-50 şagird beşdar bibûn.

Gruba aktivitên ji bo zarokan ji di 4ê Gulanê, ji danê sibê heta êvarê bi zarokan re aktîvîte organîze kirin. BEKIR DARI ji Almanya ji bo aktîvîteyên zarokan hatibû. Wê rojê qasî 60 zarok tewlî aktîvîta bûn. Birêz BEKIR DARI ji zaroka re hem çîrok, henek gotin û lîstikên ji hêla Anatoliya Navîn bi wan re lîst û hem jî hinek dersên wêne çêkirin û boyax kirinê dan wan. Ew aktîvîteyên BEKIR DARI ji aliyê zarokan ve pir hat hez kirin. Ew roj BEKIR DARI bi xwe jî pir kêfxweş bibû û digot; cara yekem e ku ez hewqas zarokên kurda bi hev re dibînim. Hemû jî bi kurdî

Samî Küçükkara û Apê Reşît, ji bajarê Göteborgê

www.alakurd.org

Piço ji Kelhesen, li Danîmarkê dijî.



Fîgen û gruba muzîkê
Fîgen ji Hecîlera ye, niha li Danîmarkê dijî.



Foto: H. Balta

Ji şeva şahiyê çend dîmen

www.navkurdi.org

Dîmenek ji şeva şahiyê.

dizanin û ez jî îro li vir bi wan re tenê bi kurdî qise dikim û ders didim. Ew ji bo min tiştekî pir mezin e!.. Min nedikarî vî tiştî di xewnên xwe de jî bidîta. Piştî aktîvîtan hemû zarokan re şîranî hat belavkirin û ji her zarokekî/ê re kitêbek wek diyarî hate dayîn. Zarok pir bi kêf vegerîn mala xwe. Piraniya wan heta dawî sekinîn, destên wan ji me nedibûn!

Êvara 4ê Gulanê şeva şahîyê bû. Şeva şahiyê jî ji aliyê komîta şevê ve hatibû organîze kirin. Şeva şahiyê di salona mekteba Fittjaängsskolanê de çêbû.

Di şevê de ji dengbêjên Anatoliya Navîn ku li Swêd û Danîmarqê dimînin, çar kes beşdar bibûn. Ji bajarê Göteborgê **APÊ REŞÎT** û **SAMI KÜÇÜKKARA** û ji Danîmarqê jî **PIÇO** û **FÎGEN** bi kilamên ji Anatoliya Navîn rengeke kurdî dan şevê. Nêzikî 500 kes hatibûn şahiyê. Gîştika wek malbatekê heta derengiya şevê bi hev re govend kişandin.

Mamostên zimanê kurdî û Waqifa Kurdên Anatoliya Navîn heta dawî pişgiriya şevê kirin. Gelek însanên ji Anatoliya Navîn ku hatibûn şevê dilşahiya xwe nişan didan û şeva şahiyê bi dilekî şa dawî hat.

Di wan du rojên kulturî yên kurdên Anatoliyê de hem jî bo swêdiyan û hem ji ji bo kurdên me bi xwe jî, tiştek hat diyarkirin ku kurdên Anatoliya Navîn ji xwedî ziman, folklor, çand û dîrokeka dewlemend in. Divê ew jî wek her mîletekî din bi çand û dîroka xwe serbilind bin, folklor û zimanê xwe biparêzin û bi pêşbixin.

www.arsivakurdi.org

Ez îsal havînê çûm Amedê. Min ji du hevalên kevn ên Fehmiyê Bîlal tîka kir ku çi wêne û çi berhemên Fehmiyên Bîlal li cem wan an jî li cem kesekî din hene bidin min bi şertê ku ez wan biparêzim û biweşînim. Ji wan yek Mele Xalid û yê din jî Şêx Heybetê Hênê bû.

Çend roj piştî hevdîtina me Şêx Heybetê Hênê çû rehmetê. Mala van herdu kesan ava be, tîka min neşikandin, wêne û helbesteke Fehmiyê Bîlal dan min. Ev wêne û helbesta Fehmiyê Bîlal heta niha nehatine weşandin. Ji xwe heta niha ji derî wêneyeke wî yê ku bi grûbeke re hatiye kişandin tu tişt nehatiye çapkirin.

Ji bo ku hevalên Fehmiyê Bîlal arşîva xwe ji min re vekirin û ev wêne û helbesta wî dan min, ez ji wan re gelek spas dikim. Min jiyana Fehmiyê Bîlal ji xebateke Amed Tîgrîs ku li ser Licê dixebite, girt.

Seîd Guven

Fehmiyê Bîlal

(Sekreterê Şêx Seîd)

Fehmiyê Bîlal di sala 1887an de li navçeya Licê ji dayîk bûye. Ew di şerê Şêx Seîd de bi navê **Fehmiyê Licî** tê naskirin. Lê, Liciyan jê re **"Xalê Fehmî"** digotin.

Fehmiyê Bîlal li gor dema xwe mirovekî xwenda û zana bû, bi kurdî, tirkî û fransî dizanibû. Mirovekî rewşenbîr û materyalîst bû. Fehmiyê Bîlal di xortaniya xwe de ketiye nav têkoşîna netewî û bi awayekî aktîv xebitiye. Ew bûye endamê *Hêvî, Kurdistan Tealî Cemiyetî* û *Cemiyeta Serxwebûna Kurdistanê.*

Di sala 1922an de Fehmiyê Bîlal û çend hevalên xwe yên din *"Komeleya Azadiya Kurdistanê* Şaxê Amedê damezrandine.

Di şerê 1925an de Fehmiyê Bîlal ketiye *Komîteya Gişti ya Birêvebiriya Şer* û ew bûye Sekreterê Giştî. Loma jê re dibêjin **"***Katibê Şêx Seîd***"**.

Di dema sergirtin û dor lêpêçana Amedê de Emê Faro û gelek serokeşîrên din guhdariya biryar, talîmat û dîtinên Fehmiyê Bîlal nakin, dibêjin: *"Fehmiyê Licî ne xwedî eşîr û ne jî xwedî mirûd e. Kesekî wî tune. Mirovekî xwenda û rafizî ye. Nimêjê jî nake. Em çima guhdariya wî bikin."*

Radibin giliya wî bi Şêx Seîd re dikin. Şêx Seîd dixwaze wan îqna bike û dibêje: ***"Lê Fehmiyê Licî kurd e!"***

Dîsa tê gotin ku heger komutan û serokeşîran bi gotin û taktîkên Fehmiyê Bîlal bikirana, dê ne avêtina ser bajarê Amedê, bi tenê dor lê bigirtana, giraniya xwe bidana ser riyên ku ji Mêrdîn, Riha û Elezîzê tên Amedê. Rê li pêş eskerê Komarê bigirta, dîsîplîn û taktîkên gerîlayî bi kar baniyana.

www.arsivakurdi.org

Piştî têkçûna şerê Şêx Seîd, Fehmiyê Bîlal bi çend hevalên xwe ve derbasî Îraqê dibin. Wê demê Îraq di bin bandora Îngîlîzan de bû. Heta efûya giştî ew û lawê Şêx Seîd, Elî Riza û çend hevalên xwe yên din, li Îraqê dimînin. Elî Rîza û hevalên xwe ji bo avakirina rêxistineke Kurd, Fehmiyê Bîlal ji Îraqê şandine Suriye û Lubnanê ku wê demê ew jî di bin bandora Fransê de bûn. Gelek sîyasetmedar û ronakbîrên Kurd ên wek wan jî ji Bakur revîbûn û li wir dijiyan.

Fehmiyê Bîlal li wir, ji mala Bedirxaniyan, Celadet û Kamran û ji mala Cemîl Paşa jî, Qedrî Cemîl Paşa û Ekrem Cemîl Paşa û bi gelek kesên din re têkilî datîne û civînan çêdikin. Fehmiyê Bîlal jî di nav de, 15 kes di sala 1927an de bi navê ***Xoybûn*** partiyeke dadimezirînin.

Dem dema serhildana Agiriyê ye. Xoybûn biryar digire ku piştgiriya serhildana Agiriyê bike.

Tirk ji bo ku yekîtiya Kurdan xerab bikin, di sala 1928an de efûyeke giştî derdixin.

Fehmiyê Bîlal û Şêx Elî Riza dibin aliyekê din, Mala Cemîl Paşa û Bedirxanî jî dibin aliyek û Xoybûn dibe du beş.

Cigerxwîn, di vê mijarê de dide dîyar kirin ku rast e, Fehmiyê Bîlal ji bo damezrandina Xoybûnê ji Îraqê derbasî Suriyê bûye. Lê ew û Mala Şêx Seîd beşdarî damezirandina Xoybûnê nebûne û Seydayê Cigerxwîn di derheqê vê bûyerê de wiha dinivîse:

"... Her wek ku hin mirovên weke zarowên Şêx Seîd û Fehmî Efendiyê Licî jî, li Îraqê bûn ku serê pêşî xwestin bi hev re vê civatê (qest Xoybûn e.) çêkin. Lê dawî li ser mezinahiya civatê li hev nekirin û di dawî de tirkan têborînek (efûyek) derxist û Elî Riza û hevalbendên xwe çûne nav Kurdistana bindestê tirkan. Civat ji hevalbendên Mala Bedirxan re ma. Ji axayê mezin Haco Axa, Emînê Ehmed, Yado Axa, Sadîn Axa di Xoybûnê de mabûn. Her yek qamçiyekî zîvî bi diyarî dabûn wan. Lê Taşnaqan ji alîyekî ve alîkariya Kurdan dikir û ji alîyekî ve doza sê parên Kurdistanê dikirin.

Di xerîta welatê xwe de danîbûn û ji ermenan re digotin: "Erê em peran ji we distînin didin Kurdan lê em kûçik bi kûçik didin kuştin."

Û Cigerxwîn di heman nivîsara xwe de çûndina bira, zarokên Mala Şêx Seîd û Fehmiyê Bîlal a Tirkiyê di cîh de nabîne û wiha rexne dike:

"Bi rastî çûna hevalbendên Mala Şêx Seîd û zarowên wî ji kurdan re kêmasiyeke mezin nîşan dan. Bi her kesî dan zanîn ku kurd negihaye serxwebûnê, rast e, gunehkar û binbar e.

Herçiqas me ji wan re got, lê nexwestin bê perwa xwe avêtin bextê dijmin. Dev ji doz û daxwazên xwe berdan. Herwekî ku Fehmî Efendî ji min re got: Hêj tu zaro yî, bi pîşik vîlikên Mala Bedirxan Paşa nizanî, bi van re bi carek derbas nabî...." (Cigerxwîn, *Jînenîgariya Min,* rûpel 176, Weşanên Apec, Stockholm-1995)

Fehmiyê Bîlal, Şêx Elî Rîza û hevalên xwe di payîza 1928an de ji Îraqê vedigerin Tirkiyê. Dewlet wî digire û dişêne nav tirkan sirgûnê. Fehmiyê Bîlal sirgûnê bajarê Ispartayê dikin. Piştî sirgûnê ew vedigere Kurdistanê. Demeke li Darahênê, Xinûs û li Licê erzûhalvaniyê dike. Piştre kal dibe û rewşa wî ne baş dibe li Amedê li cem hin hevalê xwe dimîne.

Fehmiyê Licî di sala 1967an de, li Amedê diçe ser dilovaniya xwe û wî dibin

www.arsivakurdi.org

Fehmiyê Bîlal, di salên 1960î de li Amedê, li ber mizgefta Pêxember

www.arsivakurdi.org

Licê li cem ziyareta Şêx Îsmaîl binax dikin.

Fehmiyê Bîlal ji derî sîyasetê, bi karê edebî ve jî mijûl bûye. Tê gotin ku wî 12 çîrokên ku di nav xelkê de bi navê *Mamê Hîto* tên nasîn, berhev kiriye û nivîsandiye. Ji wan Yek *Giliya Daran* e. Çîrokên La Fonten ji fransî wergerandiye kurdî. Mixabin hemû berhemên wî an ketine destê polîs û hatine îmha kirin an jî wenda bûne. Ji helbesta Giliya Daran beşek di bîra hevalên Fehmiyê Bîlal de mabû. Ez li jêr vê beşê ji we xwendevanênan re pêşkêş dikim.

Giliya Daran*

Şevek ji şevan rojek ji rojan
Roj li ser çiyayê Cebexçûrê çû ava
Karwanên êzingvanan hatin
Di bin darekî mazî ya kevnar
Werîsên xwe danîn erdê
Û bivir danî ser kevirekî
Li benda ronahiya sibê sekinîn
Ew dara mazî gazî dor î berê xwe kir
Gote wan "Ev weha nabe
Bivir dîsa waye hatiye
Wê piştî qasekî wek hergavî
Dê serê me bibire
Divê em ji xwe re serokek bibjêrin
Da ku bi bivir re mijûl bibe
Jê hêvî û rica bike
Belkî li me rehmê bike
Wan wê dara mezin a kevnar
Ji bo xwe kirin wekîl
Wê darê gazî kir û got:
Begê min ma qey ne bes e?
Eva bi salan e, hûn serê me dibirin
Kokên me ji erdê radikin
Bi tevlî ku em bi darên mazî
Ji darê din gelekî fêdetir in
Her çi darên din salê berekî wan hene
Lêbelê yê me salê sê-çar berên me hene
Mazî, gangol, gijik, şepik, antûve, berzî
Pelên me dibin alifê pez
Şaxên me dibin şewata tenûran
Êzingên me dibin şewata zivistan,
Darên me dibin mirdiyaqên xaniyan
Rayên me avê ji bin erdê dikşînin
Dibe jiyan ji bo zeviyan
Bivir got: Heso tu bi du aliyan ve şaş î
Carekê tu hêviya însaf û merhemetê ji min dikî
Mixabin ew di cewherên min de tunin
Ya diduyan ez hêza xe ji te digrim
Serê te bi destê te dibirim
Ger nedî min destîbivir
Ha ez û ha kevir
Ev mesela kurdan e
Derdê serê derdan e
Hinek heramzade ne
Hinek nankor ewlad hene
Heta kurd destgir û piştgirên neyar bin
Hertim dê di bin nîr de bêçare û belengaz bin.

Fehmiyê Bîlal

*Ji devên Mele Xalid û Şêx Heybetê Hênê

www.arsiv.org

KOMELA ZIMAN Û KULTURA KURDÊN ANATOLIYA NAVÎN hate sazkirin.

Roja şemîyê 3 ê çiriya paşîn, komek Kurdên Anatoliyê li bajarê Kölnê (Elmanya) komcivînek çêkirin.

Ji Elmanyayê 35 kes beşdarî civînê bûn. Wan komela ziman û Kultura Kurdên Anatoliya Navîn saz kirin.

Amancên komelê li gora destûrê ev in:

1. Piştgiriya fikrî û malî dide projeyên ku parastin, hevisîn û pêşvabirina ziman û kultura kurdî û lêkolînên di heqê tarîx û jiyana civatî ya kurdên Anatoliyê dane pêş xwe.

2. Daxwaz dike ku îmkanên hînbûna zimanê kurdî, bi awayekî resmî li Tirkîyê û li welatên Ewrûpa bêne peydakirin.

3. Endamên xwe, kurdên koçer û multecî û zarokên wan ên li Ewrûpa, xasma yên li Elmanyayê têdigihîne ku hînbûna zimanê elmanî sewa bi hev ra jiyîneke bi aştî û perwerdekirineke serketî hewce ye.

4. Piştdayina xebat û hewldanên ji boyî hevdu baş famkirina gelan û aştî û dîyaloga navbera dîn û kulturan dike.

Kar û xebatên ku komelê dane pêş xwe ev in:

Pişgirtiya kovara Bîrnebûnê kirin, avakirina dersxane û mektebên zimanê kurdî li welêt û li Ewrûpayê, weşandina kitêb, CD, kaset û hwd.

Di komcivînê da wekî daxwaz û nêteke baş hate dîtîn ku komela her sal, roja **22ê Avrîlê** wekî Roja ziman û rojnamaveniya kurdî bi bîr bîne û pîroz bike.

Komcivînê, Mustafa Mıx, Yusuf Polat, Şevket Özcan, Vahit Duran, Fikret Yıldız, wekî endam, Yasemin Kutlay û Îhsan Türkmen jî wekî cîgirên komîta rêvabirina komelê hatin hilbijartin. Hatice Polat û Temelî Bayrak jî boyî organa, mufetîşên hesab kontrolkirinê hatin hilbijartinê.

Sazdarên komcivînê boyî carekê alikarî dane komelê. Bi vê rê, tevhev 12 hazar euro hat berhevkirin.

Sazdarên Komelê:

Mustafa **Mıh,** Yusuf **Polat**, Şevket **Özcan**, Vahit **Duran**, Ihsan **Türkmen**, Ecevit **Yıldırım**, Cahit **Duran**, Bekir **Darı**, Muzafer **Özgür**, Ali **Çiftçi**, Haci **Erdoğan**, Seyfoyê **Asê**, Nuh **Ateş,** Mehmet **Bayrak**, Ali **Yağcı**, Ali **Coşar**, Nedim **Ateş**, Ömer **Biçer**, Behram **Alabay**, Temeli **Bayrak**, Yusuf **Yıldız**, Hatice **Polat**, Fikret **Yıldız**, Esat Kenan **Alabay**, Nevzat **Taşkan**, Tahsin **Demirsoy**, Kemal **Harimci**, Efe **Apaydın**, Yasemin **Peker**, Yaşar **Ünlü**, Bilal **Yıldırım**, Hüseyin **Kişniş**, Yusuf **Yeşilöz**, Yusuf **Göktepe**, Özgür **Kara**, Faik **Balcı,** Nurşen **Gençağa Kaya**, Sultan **Dağ**.

Komela Ziman û Kultura Kurdên Anatoliya Navîn bi xêr û pîroz bê!

Bi navî komcivînê, ***Komîta rêvebir***

www.arsivakurdi.org

Ahmet Duydu

Klîma û ziman

Di pêşdeçûna axaftinê de, klîmayê bandoreke mezin li mirovî kir; mesela di klîmaya rojhilat û başurê de, hewcedarî ji hirsê dizê, lê di welatên bakûrê yên sar de, hirs ji hewcedarîyê dizê û zimanên welatên rojhilat û başûrê wek keçên bedew ên mecbûriyetê, bi tundî ji menşeya xwe, ji hirsê derdikevin.

Di klîmaya ku neh mehên xwe xwedî sermayeke tijî mirin de; ji bilî çend hefteyan, di bin hasreta tirêjên germ de, di cîhê ku tenha xwedî zahmetî û pêrîşanî de, meriv mecbûr dimîne ku bi kar û bar der û dorên xwe ve girêdayî be. Her tiştek di bin limîta hewlên fizîkî de ye. Li gel van dijwarîyan, hestên mirovî nikarin pêşde biçin. Va jî axaftinê sar û giran dike. Ziman ji bêjeyên mecbûrîyetê pêk hatiye, lewma ne helbestî ye. Tê de evîndarî tune, bêjeyên yekem ne ji min hez 'bike-aimez moi", lê alîkarî min bike'-aidez moi" ne. Ango civat bi hewcadarî û bi xebetê hev re girêda ye. Di bin hudûdên klîmaya ku ew civaka lê dijî de, jîyan tu alternatîvên din nabîne; sewa ku birçî nemîne û neqefile tim û tim dixebite lewma jî, bêjeyên evîniyê, hez û şefqetê nayên dîtin û bikaranîn.

Mîrovê bakûrê jî pir hirs e, lê di hirsên mîrovê rojhilat û başûrê de germahî, şefqet û şehwet heye û mêla wî, tim li evînê ye. Di têkiliyên merivên bakûr de, germahî û huzûr nîne. Bi vê bandorê di awazên dengên bakûr de, hişkî, têhdît û tirsank (tehlîke) çêdibe, va jî peyvan qebe û sert dike.

Zimanên Rojhilat û Başûrê ên kevn bi tevahî ne sîstematîk û ne jî rasyonel in. Zimanine jiyanî û mecazî ne. Zimanê kesên yekem, her çiqas zimanekî geometrîk be jî, bi qasî wê helbestî ye. Wek tê gotin bûyîna zimanî, îfadekirina hewcedariyê ye, berî vê hest hene, ango hewcedariya huzûrê û bandorên wê hene, paşê gotin tê.

Çatiya zimanê rojhilat û başûrê, di xwe de rastiyên bedew ên nedîtbar (abstrakt) dihewîne; tê de giyan mîna bîhn, ba û bahozî ye. Mevhûmên giştî, di nedîtbariya xwe; wek hay, xeyal û şibandinê pêş de çûne.

Dengên rojhilat û başûrê; zirav û sivik in, tê de eqsent û aheng hene. Lê li hemberî vê dengên bakûrê, giran, qebe, tîz û monoton in. Mesela ji zimanên bakûrê Almanî, Fransî û Îngilîzî her çiqas di herêmên xwe de li

www.arsivakurdi.org

pêş bin jî, dema ku Pêxemberên Xwedê dixwezin sirên xwe ên pîroz îlan bikin, kesên ku dixwezin zagonên mantiqî bidin gelê xwe û dîsa serokên ku dixwezin gelên xwe têxin bin bandora xwe, pê re bi erebî û Farisî dipeyivin. Lê, li gel vê xweşî û başiya xwe, zimanên başûr û ên rojhilatê, di nivîsandinê de zindîtî û germahîya xwe wenda dikin. Lewra di nivîsê de, herf nikarin dengan bi derxin û lewma jî bêje şunakin maneyên jidil, li xwe bar kin û şîrove bikin. Şîroveyên nivîskî wek sûfetên kesên mirî ne.

Bi nermî û germiya dengan, an jî, hişkî û sermiya dengan, ziman wek stran û axaftinê ji hev vediqetin. Di zimanên bakûrê de, stran tund, giran û sar in. Lewma jî van gelan, xwe bikujin jî, dengên wan ji dengên quxuyan xweştir bi der nakevin.

Zimanên Rojhilat û Başûrê; jiyana ku devê mirovî dertê, helmeke bê navber, helbesta ku resmê xwe hatî çêkirin û gîyan bi xwe ye. Nefesa ku tê guhan, a wek bayê hênik, a ku fermanên Xwedê bi lêv dike, bi van zimanina pêk hat. Û karekterên mirî; ên ku bi çalakiya xwendinê û hest û hirsên jiyanê ji nû ve zindî bûn, bi van zimanan hatin resmkirinê.

Eger kesek hindik be jî, bi Erebî bixwîne û bi evinî pelên Qûranê wergerîne; dê tê de dengên Muhammed ê ku bi rîtmeke xweş, bi awazeke nerm û bi eqsenteke sivik hîtab dike, bibîne. Di van zimanan de berê guh ber bi deng û awazê dibezin, dû re ji dil xwe digîhîne vê xweş ahengê. Di her hevokê de kelecan û coşeke ku bi bawerî, mirovî dihejîne, heye. Û meriv bêhemdî xwe diqîre û dibêje:

Pêxemberê mezin!, Nûçevanê Xwedê! Şan û şerefê û şehadetê bi nesîbî min ke, da ku ez an fetih bikim an jî, li rêya te bimirim.

Lê li hemberî vê, eger di dema nuha de Xwedê bi nebîyê xwe re biaxife, dibe ku bi Firansîya Parîsê an jî bi Almanîya Berlînê biaxife. Ji ber ku êdî hest azad bûne, bi pêşdeçûna teknolojîyê re tirsa birçîbûn û qefilînê nemaye û dîsa zengînîyê bi xwe re derîyê û rêxistinên bi her cûreyî ziman pêşda birinê. Lewra di zengînîya zimanî de nebaş hene, çand û çalakîya wî heye, bi kurtasî çendî ku mirov heye, ziman jî heye. Û ziman li her derê û bi her cûreyî, bi taybetî û bi cihêtîya xwe heye. Ango ziman bi qasî dîrok, sosyolojî, teknolojî û erdnîgarîya ku lê dijî heye.

Çavkanî: 'On the orijin of the Language' - *J.J. Rousseau, J.G. Herder*

Not: Ev nivîsa balkêş û hêja bi îdîayeke ilmî ve hatiye nivîsîn. Lê di nivîsê de meriv nizane ka kîjan hevok û dîtin yên çavkaniyê ne û kîjan yên niviskar in. (Red.)

www.arsivakurdi.org

Nuh Ateş

ÎDA QURBANÊ - QURBAN SERJÊKİRİN

Ji îdên qurbanê yeke din derbas bû. Muslumanan mîna hersal, dîsa xençerên xwe tûj kirin, pê hêştir, ga, mange, beran, mî û kavir serjê kirin. Berxên teze û çavbelek jî.

Carake din, xwîna berx û kaviran di henîya zarokan dan. Zar û zêçan dersek din ya xwînrijandin û serjêkirinê dîtin.

Hersal, li îda qurbanê bi mîlyonan heywan tên serjêkirinê û telefkirinê. Tê gotinê ku li ser rûyê dûnê mîlyarek Musluman heye. Ji vana, bi texmîn em bibên, nîv mîlyar qurbanê serjê bike, ev dike nîv mîlyar heywan. Nîv mîlyar heywan di rojekê da tê serjêkirinê. Her yek ji wana du lître xwîn bide, ev dike mîlyarek lître xwîn; pê goleka ji xwînê çêbibe. Va rîtuala xwînrijandinê hersal dubare dibe. Yanê hersal, qasî ava golekê xwîn tê rijandin.

Heywan jî bi can û ciq in. Ew jî jîndar in û mîna me bi êş û şabûnan dizanin. Mîyek, wexta berxa xwe wenda dibe, şaş dibe ku çi bike. Ew vir da û wê da dibeze, dike kalekal, lê digere. Wexta hevdu dibînin, tu were sêra şabûna wana. Kavirekî niggirêdayî û li ber kêrê, serîyê xwe bi herdê va dide û bi nigan li ber xwe dide, tu ê bibêjî ewî pê dizanê ku çi ê were serê wî.

Boyî çi qurbanê serjê dikin?

Dibên, sewa xatirê Xwedê, sewa ku rizaya wî bistînin.

Ma Xwedê bi hewêsa xwînrijandinê ye? Ma ew çi Xwedê ye ferman daye ku hinek jîndarên wî, jîndarên wî yên din serjê bikin?

Dibên, boyî ku xizan û sêwîyan ter û şa bikin.... Sewa qirika xwe têr bikin... Sawa goştxwarinê lo! Bismîllahî dikin û kêrê diavên ustûyê berx û kavirên çavbelek û rûmelek.

Malneketno, sûcê berx û kaviran çi ye? Qet nebe, pezê pîr û ji hal da ketî serjê kin. Yan jî heywanan berê bîrva bibin, paşê serjê kin. Na, ji xwe ra kirine edet an weng hu kirine; sewa xêrê, heywanan didin ber kêrê.

Qurban serjêkirin karê mêra ye. Qurbana ku bi destê jinan hatîye serjêkirin heram e. Baş e, qet nebe jin heywanan serjê nakin.

Mêr, kêr û qurban sê peyvên navendî ne di kultura qurban serjêkirinê û mêritîyê da. Mêr û kêr du peyvên nêzikî hevdu ne û pir rind jî li hev tên. Lihevanîyek;

www.ersivakurdi.org

Mêrê mêr
Di dest da kêr
Bi çogan ketiye ser kavirê nêr

Haho, çi mêr e, lo!

Boyî ku xizanekî têr û şa bikî ne gerek e, ku meriv heywanakî serjê bike. Xizanekî ji salê rojekê têr bikî, lê 364 rojan birçî bihêlî, ma vana çi heş in?

Dera ku meriv rê li xizanîyê bike; wê ji ortê rake. Xizan û birçî divê bibin xwêdîyê kar û xebat da ku ew muhtacê yên bi heyî nebin. Hîngê hewcedarîya qurban serjêkirinî jî namîne. Lê ne ûsa ye.

Tu mêz dikî, musluman li welatên Ewropa jî qurbanê serjê dikin. Halbûkî li Ewropa kesên muhtaç tunin. Sewa goştxwarinê jî ne hewce ye ku merî qurbanê serjê bike.

Bingeha kultura qurban serjêkirinê an qurban dayînê, ji alîyekî da digêhijê dîn û bawerîyên kevin. Li gora dîtin û mitaleyên dînê yekxwedê, xasma dînê îslamî hertişt bi destê Xwedê ye. Dunê û jîndarên li ser rûyê dunê, meriv, heywan û nebat giştik Xwedê afirandine. Ji vê ye ku bi Xwedê bawer kirin, li ber wî xarve hatin û ji wî ra qurban serjêkirin wekî ferz tê qebûlkirinê.

Ji jîndarên Xwedê, meriv xwe wekî yê terî birûmet û biaqil dizane. Ew xwe serekê jindaran dihesibîne û şûna xwe di navenda jîyanê da dibîne. Ji merîvan jî mêr xwe bilindtirî jîndarên din qebul dike. Ne teseduf e ku Pêxember gişt mêr in. Jin, zarok, heywan û yên din ji mêran şûn da tên û sewa rihetî, têrbûn, şabûn û bextewarbûna wana hene.

Qurbankirin û serjêkirin di zimanê kurdî da û di rabûn û rûniştinên kurdan da şûneke ne piçûk digrin. Gotina, "Ez qurban" di zimanê kurdî da her roj bi kar tê. Berî giştikan jî, gilî û gotinên jinan bê "Ez qurban" nabin. Nimûnek:

"Ez qurban, tu bi xêrhatî. Ez quban, were hundur rûne... Ez qurban, ji te ra xwarinekê çêkim... Ez qurban, îşev li mala me rakeve..!"

Jin, xwe her roj bi dehe caran dikin qurbana mêran. Ew ji jinan ra nabên, "Ez qurban". Heger bibên jî, pir kêm dibên.

Di zimanê rojê da gotina, "lo lo, delalê min, eza xwe ji te ra serjê kim" jî ya jina ye. "Mêrikan xwe ji me ra serjê kirin" yan jî "xwe ji me ra kuştin!". Va jî,

www.arsivakurd.org

wexta ku diherin mêvandarîyê û xwedanên malê ji mêvanan ra azam û îkramen giran dikin, tê bikaranîn. Rîtuala serjêkirinê ketiye nav gotinên kurdan yên mezinan jî. Nimûne; "Berxê nêr bo kêrê ye." Lê merivê nêr bo çi ye? Ew ji bo berxkujî û berxxuriyê heye. Meriv, mêr bi guran va nêzikî hev in. Tu ê bibêjî mûyekî gur bi mêran va heye, an jî hormonên guran bi mêran va hene. Di hundirê her mêrekî da gurek heye. Gurên hinekan kedî kiriye, yên henan jî bejî (kûvî) ye û tim li benda xwînrijandin û goştxwarinê ye.

Di hundirê min da jî gurekî dev-bixwîn heye. Min gurê xwe hîn tam kedî û zept nekirîye. Di xortanîya xwe da min ezîyet bi heywanan kirin û ew serjê kirin. Ez ji goştxwarinê hez dikim. Min tu caran boyî îda qurbanê heywan serjê nekirin, lê min goştê qurbanê xwar. Jîyan bê goştxwarinê jî dibe, lê de tu were, dev ji berdana goşt ne hêsan e. Berê min goşt pir dixwar, niha va çend sal in, ku ez kêm dixwim. Herhal gurê min berê xwe ber bi kedîbûnê kirîye. Wexta ku mirim û ketim gornê, dizanim ku heywanên bin herdê, kurm û kêz ê li ser meyîtê min bicivin û goştê min bixwin û heyfa heywanên ku min serjê kirîye û goştê wan xwarîye ji min helînin. Heqê wana ye.

Heywan jî jîndarekî tim nepak e. Heywan hene, mîna me ew jî goşt

dixwin û sewa vê heywanan dikûjin. Di vî alî da ew nêzikî merivan in, destbirakî wana ne. Meriv dikane îdîa bike, ku yê di nav kultura serjêkirin û qurbandayînê da mezin bûye, xwîna qurbanan di henîya xwe daye û bîhna xwînê kişandiye bêvilan, destê xwe zû dihere lêxistin û kuştinê. Ku kete tengîyê, ewê merivan jî bikûje; sewa namûsê keçika xwe, sewa qûçeke xwelî cîranê xwe, bi navî Xwedê, dewlet, milet, partî û îdeolojîyê hevalê xwe bikûje. Dikuje jî!

Meriv tenê ne gurê heywana ye, ew gurê meriva ye jî. Binihêrin van rojan ji devê hinekan çi gotin tên bihîstin. Tu ê bibêjî, gurên wana har bûne û li qurbanan digerine.

Yek dibê; "Berê Ocalan bi darda kin, paşê dardakirinê rakin!" Yekî din dibê;"Dardakirin ji Ocalan ra hindik e. Dera ku ew di hebsê da ebedî bimê, tê da bikşîne û roj bi roj bihêle û bimire!" Hinek jî dibên; "Na, na, dardakirina Ocalan û ya yên mîna wî, di konjuktura îro da dê zirar û zîyanê bide Tirkîyê". Yanê bi a wana, ger fêdeya dardakirinê bi Tirkîyê hebe, hîngê, ew ne li dijî dardakirînê ne.

Yekî helîne bi yê din va de! Hinek jî hene, boyî ku çavên kurdan bitirsînin û pêşîyê li dewa wana bigrin, qet nexwazin dev ji tradîsyona dardakirinê berdin. Dardakirin kuştin e. Ew mêrkujîyeke sîyasî ye. Yên ku merivan dikûjin jê ra dibên, mêrkuj. Yê ku kesekî darda bike dibin mêrkuj, lê wexta ku ew paşê jî cezayê dardakirinê rake, vê carê dibe demokrat, lê demokratekî mêrkuj.

Çi qey cezayê dardakirinê nadine zimanê kurdî jî? Kurdî di çavên serdar û bindarên tirkên nasyonalîst da ne ziman e, tu ê bibêjî tofan e. Kurdî bi a wana, millet û welêt parparî û qulqulkî dike. Çi hîkmet e, çi zimanekî bi tîn û bi hukim e, ne! Ku bi şa bikin ewê herfên kurdî "x" û "w" darda bikin. Ew herdu herf di çavên wan ra diherin. Ji ber ku va her du herf cûdatîya zimanê kurdî hîn pir ber bi çav dikin, nasyonalîstên tirkan dev û lêvan di wana ra diguvişin, mîna xafîya wana teqîp dikin. Li ba tirkan û kurdan ne qîmeta însên ne jî ya heywên heye. Sewa edet û dogmeyên dînî û sîyasî ew merivan dikujin, ezîyet bi heywanan dikin û wana serjê dikin.

Can û jîyan bo herkesî xweş e. Heqê jîyînê bo her jîndarekî pîroz û bimbarek e. Bo kesên şîrpak û sahîgo jî û bo kesên sûcdar û zulumkar jî. Ji vî ecêptir resimek heye? Îda qurbanê ye, di destê hinekan da kêr, di yên hinekan da jî benê dardakirinê heye. Mî, kavir û berx dikalin, "meh, meh, meh" cîlê kêrê li hûstîyê wan dixin. Kurd bi zimanê xwe distirê dibê;"De lo, lo,lo.... dê lê, lê, lê" hema dest dikin qirka wî.

Zarok û xwendevanên kurd dibên: "Zimanê zikmakî azad be!" Ew dibên, "Em ê yê îmralîyê darda bikin ha, hiş bin" û dengê xwe bilind dikin û benê dardakirinê li ba dikin, ha li ba dikin.

Îda qurbanê li vî welatî bi vê şeklê û bi vê kêmaqilîyê, ne hewce û ne jî layiq e ku bimbarek bibe!

www.arsivakurd.org

Muzaffer Özgür

TIRSA GULCANÊ

Li herema Anatolîya Navîn, li gundekî Kurda xocekî pir zane û bi qîmet hebûye. Bi zanebûna xwe hatiye nasîn. Xêr ji karê camîyê ji bo zarokên gund jî dersên Quranê didane. Bi nivîsandina nûsqan, devgirêdayîn, mîzgirêdayîn û çareserkirina derd û kulên gundîyan ra dibûye derman.

Xêr ji însanên wî gundî, însan ji gundên doralîyan jî dihatine ba wî xoceyî. Ji bo serêşên xwe, pirsên keç, xort û bûkên xwe, li ba xoce li dermanê bi nûsqan digerîyane. Ji pirsên bûk û zavên li hew dilnekirî bigire heta heywanên xwe, daxwaz û armancên xwe li ba xoce bi nûsqên wî dixwastin çareser bikin.

Dawîya her karî jî, gundîyan di berîka xoce da pere, zêr berdidan û bi şewqekê diçûne mal. Carcar jî ji xoce ra, ya kavirek ya jî mîyeka sevr tanîne. Tim rûnê safî, bulxur, yaxdê, helaw, çalêk ard yan jî genim tanîne. Xoceyê gund bi kêf bûye. Berîka wî da tim pere pir bûne. Gundîyan carcar ji xoce pere jî dên dikirine.

Rojek ji rojên Xwedê, li çola gundekî cîran, gur dikevin nav keriyekî pêz û pir zîyan dibe. Gundî bi telaş sîlehên xwe derdixin û bi wasitên xwe dikevine dû guran. Li deşt û çîyan digerin lê guran nabinîn. Tirs dikeve dilê wan ku êvarê dîsa werin zîyana hîn pir bikin. Tên ba xoce çareyekê bibînin ku ji guran xelas bin.

Gundî hekata xwe ji xoce ra dibên. Xoce guhdar dibe. Dibê; 'Eger hûn bixwazine, ez ê nûsqekê çêkim, ez ê devê guran girêdim. Û ew ê li çol û banîya birçî bimînin û bimirin.' Gundî ji pêşnîyara xoce ra dibên erê, qebûl dikin. Xoce nûsqê çêdike û dike nav paçekî dide gundîyan. Gundî di nav hevdu da peran berhev dikin, xoce bi naz û qurnazîyê peran qebûl nake, lê gundî di berîkê da berdidin.

Rokê şinda Mala Elî Beg dawîya nimêya nîvro li camîya gund, ji bo mezinên xwe yên ku mirine, mewlûdekê bi xwandin dide. Dû mewlûdê de jî xwarinekê didin gundîyan. Hemû mêr ji camîya gund derdikêvin, tev û hev terin mala Elî Beg. Karkerên li gund kar dikin, mamosteyên dibistanê, mîvanên li gund têne li mala Elî Beg li ser xwarinê cîh digrin.

Xortên malbatê, keç û bûkên mala Elî Beg bi lez kar dikin û xwarinên di aşxanê da bi destê kevanîyên gund hatine kelandin û amade bûne, dikşînin ser sifrên lê odê.

www.arsivakurdi.org

Bi bismillaha xoceyê gund ra xwarin dest pê dike. Ji alikî da xwarin tê xwarin ji alîkî da jî deng dikin. Xwarin teva dibe. Xoce due dike. Bi lez sifre tên berhevkirinê û ji bo destşûştinê av, sabûn û leganên amadebûyî tînin odan. Ji cimatê, mezinên gund ji bo nimêya ber êvarê avdest dikin.

Ji xwarinê şinda cimata li mala Elî Beg giran giran belav dibe. Xoce û cimata rûspîyên gund, ji bo li camîya gund nimê bikin, dikevin rê.

Dema di ber mala Gulcanê ra derbas dibin, xoce ji bo nextarê camîyê amade bike, destê xwe davê berîka xwe. Nextarê ku bi benê cavinî giredayî derdixe. Bi derxistina nextarê ra ji berîka xoce cizdanê wî dikeve. Di cizdanê xoce da perêyên ku gûndîyan ji bo nûsqê dabûnê û yên ku Elî Beg kirine berîka wî hebûne.

Devdeve nîvê şevê xoce dixwaze perên di cizdanê xwe da bimjêre û bide jina xwe. Destê xwe davê berîka xwe û qirinî pê dikeve:

- Eywax, mala min şewitî! Min cizdanê xwe xistiye. Malik li min şewitî. Perên min wenda bûn.

Xoce û jina wî hemû kinc û bêrîkan mez dikin. Lê nabînin. Xew nakeve çavên xoce, hetanî nimêya sibê bi ufetûf di cîyan da rûdine. Radibe tere hundirê camîyê mez dike, dor alîyê camîyê, ber dîwaran mez dike lê nabîne.

Dû avdestê şinda bi lez tere camîyê û azanê sibe dixwîne. Teng gundî yên rûspî jî tên nimê bikin. Xoce bi telaşe hal heqatê xwe ji wan ra dibe.

Xoce ji bo ditîna perên xwe, kurikên ku sibê hatine quranê bevîsin, dişîne nav gund. Gundî vê xewera reş diwîzin. Hen pê şa dibin hen jî diêşên. Lê perê xoce nayên diyînê. Xoce devdeva nîvro ji cimata li ber dîwarê camîya gund runîştî ra dibê:

- Ez ê niha di hoperloyê da deng bikim. Eger hetanî êvare perê min nehatin dîyînê yan jî yên ku diyîne nînin teslîmê min nekin, ez ê nûsqekê çêkim ma hûn bizanin.

Xoce bi lez tere camîyê di hoperloyê da dibê:

- Gundîno! Min dûh nivro şinda li rîya mala Elî Beg cizdanê xwe wenda kir. Eger ku kesî dîye, ma hûne û bide min. Ez ê lê due bikim. Eger kesên dîyîne nînin û nedine min, ez ê mîza wan girê bidim. Ma xebera we hebe.

Li Gund, mala Berfo xizan û belangaz bûye. Mêrê Gulcana Sil çend sala berê dema şivanê kerîyên mala axê bûye, êvarekê nişkava li çolê gêr dibe û dimire. Gulcan bi çar zaroka va bi tenê dimîne. Ji bo îdara dinê ji gundîyan ra bi peran nên lê dixe.

Rojekê berê wê jî, Gulcana mala Berfo, li tandirê dîsa nanê mala Temo lê dixistîye. Xelaskirina nên şinda, tandirê pa dike û arê tandirê dibe li ser sergînê (qûling) velo dike. Li kêleka sergîn cuzdanê xoce yê wendabûyî dibîne.

Dor alîyê xwe mez dike û heydine dike paşila xwe. Difikire û biryara xwe dide. Bi wan perana dikane ji bo zarokên xwe kinca bikire, zivistanê ra qatix, ard, bulxur, komirê bikire. Qet ji kesî ra kat nake.

Lê Gulcan gotinên xoce jî dibîze. Tirs dikeve dilê wê. Lê ji ber xizanîyê deng nake. Xwe bi xwe due dike; 'Xwudêyo, min ef bike. Li vê dinê min

www.arsivakurdi.org

qe rok nedî. Ez ê hetanî êvarê li ber teştên nanî gundîyan dimirime. Min ef bike. Ji bo zarokên min. Min ef bike. Ez wan perana nadim xoce. Tu yî zana yî. Tu yî mezin î. Min ef bike.'

Lê gotinên xoce ji aqilê Gulcanê dernên. Tirs dikeve dilê wê.

Hetanî êvarê tu xeber ji nav gund dernên. Xoce ji nimêya Yasîna şinda li camîyê bi tenê dimîne. Nimê û due dike.

Êvarê xew nakeve çavê Gulcanê. Xwe li ber cîyên kurikan dirêj dike. Devdevê siwê Gulcan bi zikêşê dikeve. Li mala Berfo zarokên Gulcanê gî ji xewê radibin. Keçika Gulcanê ya mezin tere banî jinên cîrana dike. Jinên cîrana ji bo nexwaşîya Gulcanê tên mala Berfo. Kevirekî germ dikin didin ser zikê Gulcanê. Lê êş her demê zêde dibe. Xeberê ji jinepîra gund ra dişînin ew jî tê lê mez dike. Her wext derbas dibe zikê Gulcanê diperçive. Nexwaşîya Gulcanê di nav gund da belav dibe.

Sibê zû li ser kanîya gund jina xoce jî hekata Gulcanê dibîze. Vedigere mal ji mêrê xwe ra kat dike. Xoce dibê:

- Mala Gulcanê li kêleka rê ye. Min perên xwe li ber mala Gulcanê wenda kirin. Xwedê dizanê Gulcanê perên min dîn.

Jina xwe dişîne mala Berfo. Dibê:

- Herê hela Gulcan çima nexwaş e, rewşa xwe çî ye?!

Jina Xoce tere mez dike Gulcan perçiviye û êşa wê pir e. Hema vedigere tere mal. Xoce ra kat dike. Xoce dibê:

- De here Gulcanê ra bê eger cizdanê min dîye ma bide te.

Jina xoce dîsa terê mala Berfo û li ber metîla cîyê Gulcanê rûdine pê ra dibê:

- Gulcan, qîza min te perên Xoce dîn? Eger tu dîsa bidî Xoce, wê Xwedê te rind bike înşelleh.

Gulcan bi tirs serê xwe li ba dike dibê:

- Erê.

Jinên li dor ecep dimînin. Gulcan dibê:

- Li aşxanê di bin tasa çînko da ne.

Jina xoce cizdan heydine dibe mal. Gulcan di nav cîyên xwe da dilopên girî mîna baranê dibarîne. Jinên cîrana jê ra avê tînin, çayekê didin ser. Dilê wê yî zîzbûyî hêdî hêdî rind dibe. Çend seetan şinda tirs û fedîya Gulcanê jî derbas dibe. Êşa xwe kêm dibe.

Ji wê demê şinda gundî ji Xocê xwe pir ditirsin û hîn pir xizmetê dikin û bawerîya xwe pê tînin. Ji ber wî xizmetî, Xoce pir zêde dewlemend dibe. Çand salan şinda bar dike û tere gundê xwe.

www.arsivakurdi.org

Mem Xelikan

Bêrîvan

Li ser axa bav û kalan
Hêvîyên min binçav
Ramanên min girtî ne
Vaya ne jiyan e
Bêrîvan
Mirin e
Tu ji jiyanek azad û bi rûmet re
Dil bişidîne.

Ez li çarçirayê bi darda bûm
Li Zîlanê gullebaran
Ez li Felîstinê Leyla bûm
Li Helepçê hatim fetisandin
Bêrîvan
Desmala kesk û sor neqişandî
ji ber ben bikişîne
Bi axînek kûr
Strana jiyaneke nû bilorîne.

Di cî û warê xwe de
Di axa ku bav û kalên min kon vegirtî de
Qulingek perşikeskî
Koçeber û bê hêlînim
Bêrîvan
Ji bo aştî û azadîyê
Peyvên helbestê
Bi nêta qurşînê dicerbînim.

Gur di mijê de hatin
Dêlegur jî
Xewnên wana şevên reş dilmatin
Bûkên bavanê min
Dergûşên çelinî bêbav lorandin
Birînên dilê xwe bi axa mezala kewandin.
Bêrîvan
Kete para min
Di ewrên çavên wan de
Brûsk barandin.

Çend sala berê
Birîna dil pîne, kir ketim rê
deriyê vî ji hev kir
Ji teyrên koçeber re bû hêlîna derda
Eş û nalînên te ji bi serda
Bêrîvan
Qe ez ne dîn im
Evîneke reş û veşartî
Di dil da digerînim.

Jiyan xwaşê berxika min
Navê mirinê sar
Emrê min xewneke şeva ye
Qut û dijwar
Ez kal im, tu stûxar
Bêrîvan
Deziyê dil neqetîne
Hêviyê min bi rojê bişo
Bi avan binuximîne.

www.arsivakurdi.org

Ûsivê Mihecir -II

Ûsiv bi nîvê şevê gihêşte zinarê reşî gir yê ku li hidûdê gund li ser neqeweke pan daniştîwû. Ji wî wê da, ber ve bakûr herdê gunde Tetera dest pê dikir. Wî di kendalê zinêr da ji xwe ra tolikeke bi pûş û pelax û bi qirş û qala çêkir.

– Ez ê gavekê li vir vesêm û destek xew helînim û berî berbangê serî helînim herim.

Ûsiv di ber xwe da wer got. Ew di umrê xwe da qet ji gund derneketiwû. Ji hidûdên gund wê da dunêyên yad û nenas wûn ji wî ra. Pir nemabû ku ewê nigê xwe bavê ser herdê yad û nenas.

– Ez ê xêrnedî kuva herim? Ecêwa çi yê were serê min?

Ji tirsa, ji ber van pirsan xûzi lê miçiqibû û ne xwe ne jî hewênîya wî dihat. Wî xwe bi serhatî û bûyerên di çîrok û katên kevn ên ku wî di kuriktîya xwe da bihîstîbûn, dihewand.

Di şeva ku Ûsiv gund terkkirî da, mala Elî Axa hate dervakirinê. Zêwa jina Elî Axa siwê zû çû aşxanê. Wexta ku wê derî vekir, çi mêz ke, teqa aşxanê ya li dîwarê paşîyê xelandine. Û ji qula tandirê sê bihosta ber ve derîyê aşxanê herd vekolîne. Di wir da zêrên malê veşartî wûn. Tenê Elî Axa û jina wî, Zêwê hay ji şûna zêran hewûn.

- Wêy wêy wêy, mala min şewitî! Xwelî li serê min be!

Zewê got û bi destan li sîng û jûniyê xwe xist. Ew bi lezekê ber ve xanîyê malê çû ku vê xewera neçê bide mêrê xwe. Wê derîyê oda Elî Axa vekir, bi awayekî tevlihev, bi zimanekî lihevpiçikî û dilekî kutekutkî got:

– Elîyo Elîyo, rawe rawe, xêrnedîyo, mala me dervakirine; zêr dizîne, zêr!

Elî Axa bi teperepa Zewê bi xwe hêsîya û xwe di nav nivîna da rast kir, got:

– Çi çi keç te got çî? Keç devî xwe ji xêrê ra veke, mala me çima tê dervakirinê, Xwedê neke!

Zewê gotinên xwe dubare kirin û qala rewşa aşxanê kir. Elî Axa ji nav nivîna pekî hate ber Zewê dawestî. Benz û bed lê miçiqî, mina ku bibêjî, bi şirinqê xwîn jê kişndiwûn. Wî ji hersa ra didanê xwe yên jor di lêva xwe ya jêr ra kirin xwarê.

– Keçê, ji min û te bêtir tu kes şûna zêran nizane, heye ku te ji kesekî ra kat kir?

Elî Axa bi dengekî bilind pirî û destê xwe yê rastê berjor helna ku li Zewê bixe yan jî wê bitirsîne. Zêwê cîlê xwe da alîyekî, enî qerçimand, birû û bijang berjor helnan, çav gewr kirin, bi lez li ser hev got:

www.arsivakurd.org

– Meke! Dest helnan ji te ra ye. Ne ku newû derew, tu axa yî. Bi hemîlîyan be, bi navî Xwedê û pêxemberan be, bi serî herdu birayên min ên mêrxas be min ji tu kesî ra qala şûna zêran nekirîye. Ha, vê jî bizane, heger tu çirtê xwe pê min bikî, welleh ez ê sûva bêm herim bavana û nayêm. Ku ez bixwazim jî, birayên min, hetanî ku tu neherî ber nigên wana, min bernadin. Ew ê bi ser da jî, ji te carek din qelin bixwazin.

Wexte Eli Axa ji devê Zêwê şora qelin bihîst, temehîyê pê girt, dest li hewa lê sist bû û wî ew bi rû xwe da berda. Bi ecele kincê xwe li xwe kirin û ji mal derket ber ve aşxanê meşîya. Bi rê da, kire wêrewêr û got:

– Ew kî ye lo, ew ê ku curet bike mala min derva bike? Ne ez ê di dayk û makê ...im! Ez ê dunê li serê wi teng bikim! Ez ê xwînê di dev û bivîlên wî ra bînim! Ez Elîyê Elî Begê me looo!

Wer got û pê ra jî, wî xwe virda û wêda rakişand, te ê bigota va ye diz li hember wî ye, ew jî xwe berê wî dide.

Xebera dervakirirna mala Elî Axa zû, mîna arê pûş, li nav gund belav bû. Di piçek wext da, li ber mala Elî Axa bû hewlî. Pir neçû li nav gund, li malan, li ser kanî û banîyan qal bû, qala dervakirirna mala Elî Axa. Hen kes pê êşîyan gotin:

– Wax, wax, wax mala minê.

Hen jî, ne eşkere lê bi dizîkî pê şa bûn, gotin: 'lê rind bûye, wî heqê çend şivan û rençberan xwarîye.'

Xizmetkarên malê hatin ber dîwana Elî Axa rêz bûn. Di dilê wana da bû tirs û xof; guman hewû ku suc bavên ser yekî ji wan. Tenê Ûsivê Mihê nehatiwû. Meriv şandin pey wî. Wexta mala Mihê Mihecîr hal û heqat bihîstin, Eyşan bi rûyî xwe ket got:

– Wîy wîy wîy li minê! Qurban qurban, Ûsiv îşev nehate mal. Min xewneke neçê dit. Lawo lawo, va çi bêtar e ku tê serê me? Çima mala Elî Axa ye?! Şalê şalê, Xwedêyî mezin e, ne Ûsiv be. Heger ew be, ez şirê xwe lê helal nakim. Êmegê min berî çavan bigre; ne min bi pînekirina kincên wî ronîya çavên xwe rijand.

Bîstkê bêdeng ma, paşê jî hîng hîngî girî. Mihê Mihecîr bi dengekî bêhal got:

– Heger Ûsiv kirîye, ew di herdî reş keve û dest û piyên xwe li ba neke! Ew bi ser û pîyan va yê Alî Axa be, pê çir dike ma bike!

Xizana ji tirsa ra newêrîn ku bibên: Ûsiv vê nake! Newêrîn ku qîreta lawê xwe bikşînin. Şevderîya Ûsîv guman kire dilê wan.

Giregirên qebîla Elî Axa, axeler û rûsipîyên gund ber ve mala Elî Axa dikişîyan, dihatin ser Elî Axa, sewa xêr û xweşî gotinê. Odeya Elî Axa ya mêvanan hetanî dev tijî mêr bû. Diz kî ye û gereke çi bê kîrîn? Li ser van pirsna civat ketiwû nav fikir û mitalan. Elî Axa bi ber xwe ketî û bê deng bû. Sofîyê gund bi bismîllahîyekê dest bi şora xwe kir, got:

– Elî Axa ma tuyî xweş bî, kur û kulfetê te xweş bin. Ji xerawîya xerawtir jî hene. Xwedê sebrekê bide te û cezaye dizan pêde. Malê dunê ji vê dunêyê ra ye. Rojek ê were em ê giştik bar kin, mal û milk ji paş xwe va cîh bihêlin, herin dîwana Xwedê...

Ji mermalîyên Elî Axa yekî got:

– Bi kefşa min diz î nas e; ew Ûsikê Mîhecîr e. Ne ew be, ka çima li meydanê xûya nake?

www.desvakurd.org

Hen guhdaran, bi meneya tesdîqkirinê serê xwe mîna hespê li ber germa havînê, hêjandin. Mesto Axa, bi kuxîneke kurt qirika xwe pak kir, dû ra got:

- Na na, va ne şîp û karê Ûsikê Mihecîr e. Ûsik fuqarekî li wê ye. Ûsikê kûn bi pîne, ne ewî şu nake ku nanê xwe bixwe!

Rûsipîyekî got:

- Elî Axa, heger ez li şûna te bim, ez ê ji çar alîyan ra xeberê bişînim û bibêm, ku kê zêrên min dizîye, ma were bibê: 'min dizîye' ez ê hîngê nîvê zêran bidime wî.

Yekî digot:

- Baştir e ku Elî Axa êlan bike û bibê, ku zêrên min hatin dîtin, ez ê wana li gundîyan belaw bikim, hîngê gundîyê seferber bibin, li diz bigerin û wi bigrin.

Wexta Elî Axa ev gotin bihîstin, dilê wî miheqaq kire cîzt; wî di ber xwe da got:

- Lê lê, mala minê, ez zêrên xwe bi diz û xizanan va par va kim, weng e, nagêhin, ez kulê jî nadim wana".

Çeko Axa mîna herdem dest pê yarenîya kir, serî di ber da got:

- Sûcê Elî Axa bi xwe ye. Ewî bi du jina ye; ji heftekî şeş şevan li ba Zêwê ye, şevekê tenê jî li ba Elê ye. Ma va edelet e? Xwedê jî bi vê razî nebû û va anî serê wî.

Dû ra, di bin simêlên xwe yên çardeqkî da hî hî hî kenî. Yarenîyê Çeko tim ji duxinê berjêr bûn. Xelk hu bûbû yarenîyên wî; tu kes di qusura wî nedima. Elî Axa berê xwe wê da kir, lê di bin çavan ra neçê li Çeko mêz kir.

Elî Axa bi du jinan bû. Zêw jina wî ya siftê, Ela Mozê jî ya duduyan bû. El jina birayê Elî Axa, jina Cemêl bû. Wexta Cemal bi qezayekê mir şûn da, Elî, li gora edetê hîngê, jina birê li xwe mar kir, mal û milkê wî jî teve yê xwe kir. Ji Cemêl û Elê du lawik bûbûn. Ew cewî bûn. Navên wana Hesen û Hûsên lêkiribûn. Elî Axa neheq bû, ferq dikire navbera kurên xwe û yên birê. Yên xwe xwag û delal mezin kirin, yên birê dişandine cot û zevîyan. Zêwa jina Elî Axa jî hesûdî û nerindî li hewîya xwe û lawên wê dikirin.

Oda Elî Axa bi heyamekî vekişî û xembar dagirtibû. Qutîya tutinê di ber mêran giştan ra derbas bûbû û hatibû ber Elî Axa, şûna xwe ya berê. Dûmana cixarê ji ger û vegerên xwe yên di gewrî û pişikên cixarakêşan şûn da, di dev û bêvilên wana ra derdiket û ber ve jorî odê heldikişî û li wê, bi tîna pêlên deng û behsên civatê, dihejîya; ji şekilekê dikete yeke din. Geh dikete tonê tîremarekî, geh ji dikete şekil û şemala jineke koçek û çeleng ya ku te ê jê ra bigota, ew li gora miqamê giranî û melûlîyê direqisê.

Heyamê odê bi yarenîya Çeko hinekî nerm bû. Axayê meşhûr, Hûsoyê Bekir serî berjor bîstekê li lîstika dûmana cîxarê sêr kir şûn da, serî berjêr kir, fîncana qehwê, ya ku di navbera tilîyên wî yên girikê û şehedetê da bû, leqand bire ber devê xwe, fira dawîyê lêxist, dû ra li ber xwe deyna herdê û dest bi şorê kir, got:

- Elîyê birako, tiştê ku huro hatîyê serîyê te, mîna ku hatibe serîyê min; ez pir û pir pê êşîyam. Gerek e va zirar û zîyana bê ceza nemîne. Heger ma xerê, êdî pêşî li diza nayê girtin. Ew ê suwê maleke din derva bikin, heta ê dest dirêjî namûsa me jî bikin. Tu bi gura min bikî, tu ê du merîyan bişînî gundê C. pê şopger (îzbir). Ku te çar quriş

www.arsivakurdi.org

kirin berîya wî û jê ra nanek çêkir, ew ê şopê biwe ser diz.

Hûso, axakî li ser xwe bû. Xeyrî destferehî û comerdîyê hîn xûy taybetîyên wî yên din ên xas jî hebûn. Wexta ku ew bi rê ve diçû, destê xwe tim didane paş kûnê. Ku wî li ber dîwarekî yan quncekî mîz dikir jî, destê xwe, ji duxîn vekirinê şûn da dîsa didan paş û bi vî awayî av dirijand. Xûyekî wî yê din î xas jî ew bû ku bi nav gund da diçû, dikuxî. Ne ku kuxîna wî dihat, ji ber ku hatina xwe bide bihîstin û mêl û dîqeta xelkê bikşîne ser xwe, dikuxî. Kuxîna xwe jî bi çeşidekî bû. Wî berê serîyê xwe tenekî ber ve paş heldina, çavên xwe ber ve ezmên bel dikirin, paşê serîyê xwe giran giran serrast dikir û pê ra jî 'ûhûy' dest pê kuxîneke nerm û dirêj dikir.

Berdevk û pesnedarên Hûso digotin: 'kuxîn kuxîna Hûso Axa ye; di kuxîna wî da xuyaye, ku ewî axa ye, him jî axakî bi esl û eselet!... Axa gotîye, yê mîna Hûso be; ewî jî heqe axatîyê tê derê, tamê jê der dîxe û çîna jê koz dike!'

Elî Axa wê rojê merî şandin gundê C. pêy şopger. Devdevê êvarê şopger hat. Elî Axa jê ra qurbanek serjê kir û çend quriş kirin berîyê.

Dora din a rojê, şopger, di dest da şiveke ter, li nav gund gerî, geh li rast geh li çep, geh ber ve pêş geh jî li ser kûnê diçû dihat. Yekcara jî, bi çavgirtî diçû û pozê şiva xwe pê herdê dikir, mîna kûrekî ku bi şivê rêya xwe derdixe. Birek merî, xort û cahilê gund jî, rahêlê ketibûn. Xelk lê rawûbû sêrê. Li navberekê, şopger derkete derî gund û li cîhekî dawestî, bi pozê şivê li herdê xist, got:

-Vira bikolin!

Yên dorê, bi terf û bêran ew dera kolan û jê hestîyên heywana derketin. Yên ku hatibûn sêrê, lê ecêb man. Yekî got:

- Te dît, mêrikî pê dizanê ka di kuda çi heye, hella hella!

Henên din, serî hejandin, gotin:

- Erê welleh!"

Bi ser vê da, guman kirin ku şopger ê şopê bibe ser diz. Ew bi vî awayî hetanî nîvro gerî û paşe destbetal vegerî mala Elî Axa. Carek din xwarin û vexwarin dane ber wî. Elî Axa û Hûso Axa bi pistpistkî ji şopger ra tiştin gotin. Danê êvarê şopger dîsa dest bi gera xwe kir û li dawîyê, hate ber mala Hemê Sîsê sekinî û şiva xwe bi herdê va da, bi maneya ku bibê: 'diz î ji vê malê ye'. Merîyên Elî Axa cîlê beristin ser Hemê, ew girtin birin dîwana Elî Axa. Li ber mala Hemê bû hewlî. Jina hemê, Nadîra Omê, dest bi şînê û lomeyan kir, got:

- Gundîno, bibihîzin ha bibihîzin/ Gewrîya min xîzexîze/Hemî min ne î diz e, î ezîz e / lê çi bikim, malmêrat Îzbirî xayîn û çînevîz e!

Dem û dewraneke pir neçê bû, çaryeka esra bîsta ya yekem bû. Herba dunê ya siftê hîn nû bi dawî bûbû. Bi ser tuneyî û xizanîyê da, xerc û xurcê Dewleta Osmanî ya ku berî ber ve helweşîne kiribû, pîşt li xelkê şîkandibû. Diz û eşqîya jî pir bûn.

Hemê Sîsê debara xwe bi paletîyê dikir. Wî carcaran dizîyên piçûk dikir û li vir û wê di heqê axeleran da neçê deng dikir. Va ji digêheşte guhên wana.

Hem bi salan, emsalîyê Ûsivê Mihê bû. Ûsiv ji wî hez dikir, tenê diçû mala wî. Wana xwîna hevdu alêstibûn û bi

vê rê bûbûn xwînbira. Ûsiv, şeva ku Nazê birevîne, çûbû mala Hemê ku pê bişêwire, lê Hem li mal tunebû, çûbû gundê meta xwe.

Hem birin di goma Elî Axa ya kevn û nîvxerewe da, li navbera du kutegên darinî gîrêdan. Xulam û berdevkên Elî Axa heft roj û heft şevan bi şiveke ter li Hemê xistin. Werawera Hemê li çîya û banîyan da. Ji ber qîrînîya wî xelkê paç dikirin guhên piçûkan. Ji zar û zêçên wê salê nîvî bi werinîya Hemê ker bûn. Pez û terekeyê gund jî, ji ber qirînî û nalenala Hemê nedîhewîn. Jinebîya bî sala, Fata Reşê, ji ber ku çavê wê li zewacê bû û gotina 'Xwazika tîyekî min hebûya û ez li xwe mar bikirama' tim dubare dikir. Xelkê jê ra digot, 'wê heşê xwe winda kiriye!' Fatê li pey bûyera Hemê digot:

- Çuçike min ji ber nalenala Hemê bi derd ketin û giştik telef bûn!

Kirin nekirin, ji Hemê tu tişt derne-xistin û li dawîyê ew berdan. Wenig xûya dikir, ku Elî Axa û hevalbendên wî, ji ber ku diz ne eyan bû, ne li diz, lê li yekî ku wî têkin şûna diz gerîyabûn, ew jî Hem bû.

Diz bi rastî kî bû? Cewaba vê pirsê bi sala nehate dayînê, veşartî ma. Di heqê wê da, di nav xelkê gund da sê cure guman derketin pêş.

Axeler û derdora wana guman dikirin ku dizê zêran Hemê Sîsê ye. Her çiqas ji Hemê tiştek derneketibe jî, çavê wana li ser wî bû. Gumana yekem ev bû.

Li gora gumana duyem, dihate gotinê ku diz Ûsivê Mihê ye. Bingeha vê gumanê terkkirina Ûsiv a gund bû. De tu were, fena ku Hîto li Ûsiv kiribû, pir neçû eşkere bû. Ji vê şûn da, digotin. 'Ûsiv ji ber vê nerindîyê gund terk kiriye.' Bi vê jî, gumana di heqê dizbûna Ûsiv da pûç dibû. Kêm kesan hîna bi vê gumanê dikir.

Gumana sêyem Hopoyê Alê avêtibû hortê. Ji ber ku di malbata Elî Axa da temehî, hesûdî û neheqî hebûn, Hopo digot:

- Diz î ji malê ye... Heger yekî xerîb biwa, ma wî ê ji ku da bizanîya ku zêrên malê di aşxanê da veşarti ne!?

Pir kesan guh nedida vê gumanê. Ji ber ku Hopo ew avêtibû hortê. Axelera û giregiran Hopo bi tu tiştî nedihesibandin; ku wî bigota. 'Xwedê yek e' jî, pê bawer nedikirin.

Heft sala şûva Ûsiv vegerî hate gund. Rojeke peyîzê bû. Ew li ser hespekî kumêt, teve jin û zarên bi du kerî pez, çar şivan, çar kûçik û du keran va li dawîya gund xuya bû. Xelk bergihendê çû, ew xêrhatî kirin. Bi qalkirina wî, ew, wexta ku wî gund terk kirîbû, çûye Erzurumê, gundê bav û kalan. Li wê derê, li ba apê xwe maye. Apê wî pir qelaw bûye; tenê keçikeka wî bi navê Zêzê hebûye, lawê xwe tune bûne, mîna ku tê gotinê, ew î korocax bûye. Apê, Ûsiv kirîye nav mala xwe û keçika xwe jî lê mar kirîye. Ap dimre şûva mal û milkê wî ji Ûsiv û Zêzê ra dimîne. Pêy mirina apê, ew qerarê didin û vedigerin gunda dê û bava.

Piranîya xelkê gund bi vê serhatîyê bawer kirin. Ji vê şûn da, qedir û qîmeta Ûsiv bilind bû. Ew êdî yek ji qelawên gund bû. Berdevk û hevalên wî pir bûn. Ji mermalîyên wî yên li Erzurumê jî çend malên din jî bar kirin hatin li gund bi cî û war bûn. Bi wana va, malbata Ûsiv mezin û bi quwet bû. Tu kesî êdî ji wî ra nedîgot Mihecîr û Çelpîne, digotîn: Ûsiv Axa.

www.arsivekurdi.org

Zeman derbas bû, Ûsiv keç û lawên xwe yên berzewac bi serî kirin. Wî keçikeke xwe da lawê Cemêl, Hûsên, sêwîyê Elê, birazîyê Elî Axa. Ji lawekî xwe ra jî keçika Hemê Sîsê kire bûk û dohl û daweta wan ji kîsikê xwe kir.

Di ser dervakirina mala Elî Axa ra, nêzika çel salî derbas bûbû, hîn jî sirra vê dizîyê eşkere nebû. Çar kesan ji serî da bi sirra vê dizîyê dizanî. Dudu ji wana miribûn.

Salên Ûsiv gîhêştin ber heftêyî, ew edî kalekî li ber mirinê, nexwaş û di nav nivîna da bû. Rojekê wî bangê xismê xwe, xezûrê keçika xwe, Hûsênê Elê kir. Hûsên hat li ber balgîyê wî rûniştê. Di odê da her du bi tenê bûn. Ji ber bêhalîyê şor giran û yek bi yek ji devê Ûsiv derdiketin. Pey her gotinekê, navber dida, piçekê vedisî, paşê dewam dikir. Keserek rana, şûva got:

-Hûsên, êdî weda min hatîye; ha huro ha soh, ez ê bar kim herim dîwana Xwedê. Xwasteka mîn ji te ew e ku tu heqê xwe li min helal bikî. Tu ê niha bibêjî: ma çi heqê min bi ser te ketîye? Guh bi ser min de, ez ji te ra bibêm. Şeva ku min gund terk kiribû, mala apê te hate dervakirinê. Wê şevê, min li ber zinarê reş xwast ku destek xew helînim û paşê berî berbangê bi rê kevim. Di wî devî da, tu û birayê te Hesen hatibûn ber zinêr, lê we hay ji min nebû. Min di dengê we ra hûn nas kirin. Ji zinêr çend gavan wê da kuçek kevir hewû. We li wê derê, di bin kuça keviran da zêr kirin herdê, xwelî bi ser va kir û kevir şûn da danî ser. Di dû we ra, ez rabûm çûm, min kuça kevira û herd veda, zêr jê derxistin, birin li cîhekî din kirin herdê. Berî berbangê ez çûme gundê Tetera, min kerekî xwe î boz û rehwan, kurtanek (palanek), têr û kilavek standin. Şeva din ez hatim, min zêr derxistin kirin nav kurtana kerê û qeyim dirû. Paşê ez çûme Erzurumê, gundê bav û kalan, mala apê xwe. Apê min yekî xizan bû. Ez bi keça wî, Zêzê ra zewicîm. Min zêr hûr kirin, pê pez stand. Ji mirina apê şûva, tu jî dizanî, ez vegerîyam hatim vira. Hal û heqat va ye, de tu jî çi dibêjî bibêje û çi dixwazî bixwaze, lê heqê xwe li min helal bike!

Hûsên şaş û matmayî guh da ser Ûsiv. Wexta ku ji nav xem û xeyala heşîyarê xwe bû, keserek kur kişand, serî di ber da got:

-Çi bibêjim, zêrên apê nebûn nesîbê me, bûn yê te. Xwedê î wenîg munasîp ditîye. Ji hêla min da li te xweş û helal be. Apê me, Elî Axa, tu jî pê dizanî, li me neheqî dikir. Jina apê me jî pir hesûd bû em pir diêşandin. Şevekê, Elî Axa li mala me raketîye û ji ber xewa va deng kirîye, şûna zêrên xwe kat kirîye. Ela dayîka min a rehmetî jî va bihîstîye. Wê jî, rojekê ji min û birayê min Hesenê rehmetî ra got: 'Werin herin zêrên apê derxin bidîzin, heqê we ye. Wekî din, apê we yê temeh û jina wî ya hesûd tu tiştî, tu par û maran nadin we.' Elê, va fikra ducar û sêcar kire serîyê me. Me jî bi a wê kir. Dawîya meselê tu jî dizanî.

Hûsên dû van gotinan, serî helina û li çep, ber ve Ûsiv mêze kir, Ûsiv di xew da çûbû. Wî cîxarek pêça û vêxist, nifteke kûr kişand, bi keserekê va dûmana cîxarê di dev û bivîlan ra, mîna sê tîran berjêr hate xwarê. Ew rabû ser xwe, carek din ber ve Ûsiv mêze kir, sivik kenî, serîyê xwe li rast û çep ba kir, ji mala Ûsiv derket çû.

www.arsivakurdi.org

Altun Başaran

Hevpeyvînek bi kevneserokê Belediya Omera

Mistik Barlas re

Mistik Barlas ji gundê Omeran e. Ew bi munasebeta zîyarêta lawê xwe Hasan Barlas hatibû Swedê. Ew bi salan li gundê Omeran reîsê belediyê bû. Gundê Omeran di sala 1955an de bibû belediye.

Apê Mistik tu ji kijan eşîretê yî?

– Em ji aşîreta Reşiyan in. Em 180 salî berî vê ji Adiyamanê hatinî. Wextek eşîreta me hîn tam bi cih nebûye, wana şeş mehên zivistanê li Adanê û şeş mehên havînê jî li deştên Konyayê derbas dikirine.

Eşîreta Omeran cara siftê li kê derê ewrîne?

– Eşîrete Omera cara siftê li Tavliyê êwrîne. Dûre hinekan ji wan bar kirine, çûne Altilarê û hinek ji wana jî çûne li gundê Omeran bi cih bûne. Lê, hîn ew li gundê Omeran temamî bi cîh

www.arsivakurdi.org

Mistik Barlas li mala kurê xwe Hasan Barlas.

nebûne, hatine li yayla bircê ewrîne û di konên reş da dimane. Wextekê hatine û li gundê Omeran bi cîh bûne, êdî dest pê kirine û xanî çêkirine.

Xaniyên wana odake tenê bûye. Malbet gîştik di wê odê da dimane û perde di naberê bûk û xasiyê de dikşandine. Ji ber ku geçimê wana bi pêz tawû, wanan barî ji mêrga kesk bar dikirine yayla.

Zivistana dihatine gund. Jîyan wê wextê pir bi zahmet bû. Kibrît tune bûn. Ji bo ku agirekî vêxe, malan ji malan kozî tînan. Gundê Omeran heta 1928an girêdayê Kadinhanê, dû re Cihanbeyliyê û ji sala 1954an vir de jî girêdayî Kuluyê ye.

Karê reyîsiyê çing bû?

– Zehmet bû. Ji boy ku merî reyîsiyê bike, datak merî miriniyê xwe bi ber çavên xwe de. Kurd hesûd in. Ewêk raya xwe dayine min, nedixwestin bi yên ku ray nedane min ra tu karî bikin. Avê nekşînin malên wana û ji wan re xizmetê nebin. Ji boy ku karekî baş bikî merîk cesûr be.

Tu dûrûma Kurdan îro çing dibînî?

– Berê va îşana kesî pir nedizanî û cidiyetek tune bû. Lê, îro kurd gî yek in. Baş e û însanên me ji bo welatê xwe canê xwe feda dikin.

Lawê te Cemîl gavak şehîd ket, te çi hîs kir?

– Tabî wek bav mirina wî bi min qehr hat, lê wî qerara xwe da bû.

ÇARÎN JI HÊLA SARIZÊ-5

Çave reş in çav çi ye gir in
Qaş di ser re wek şûr in
Ne dayine te ne dane min
Ew ji canê xwe dibirin.

Similekê zeriye lê ye
Wêda here virda me ye
Ezi ji qovciyana têr im
Ê bibên dilî xwe yi lê ye.

Wînin hûn malê van wînin
Wînin li hêlê gund dînin
Ekê parlaxê di nav de
Wînin li malê me dînin.

Rahlê wê didûrun terzî
Di destekî yûsik di ekî de derzî
Heval tu xwe li bameke
Ji derdê bûme nik û derzî.

Şev da şev da nazli şev da
Çarşî bazar pê ra tev da
Çavê we şevê dirêj in
Nazli deng nekir çû bi xwe da.

Simêlekê zeriye lê ye
Î dawestiye li ber bê ye
Tu dameweste li ber derî
Çavê te yî li keçkê kê ye.

Nazliyê min di ser xelkê re
Pîsek dayniye yê perra te
Wî çutulu laqa xwe dî
Zati gunê minî pê te.

Wan çirkirin wan çirkirin
Rê û yolax li ber min pir kirin
Gû dikime wê qedirê
Dilê min jî sarkirin.

Çavê rindê min çîye gir in
Tu deng meke ez ji te nabirim
Xwelî bi serî dergistiyê te be
Çutulu ji te dibirin.

Li sûretan çiftek beng e
Mal topkirin kirine deng e
Tu were ji rev min mere
Li min kirine oyun û heng e.

Lê keçikê, lê keçikê
Bengê xwe ê li ser çiçikê
Bengê xwe veke k'ez mêz kim
Bavê k'er bûyê ji guçukê.

Qedirê min û we yek e
Kew dixwûnin tek bi tek e
Gû dikime vê qederê
Nazli birin, kirine bûk e.

Dawestiye li qarşiya rê
Keriyek pezî tê ji birre
Berê wê şor dawiye min
Darewçineke bi sirr e.

Bavê xwe yekî aksî ye
Qelind birrîn ek taksi ye
Ê indî te didine min
Tu ji çiy wan ditirsiye.

www.arsivakurdi.org

Ê dawestiye li bin bîyê
Çima rûnani li bin siyê
Gotin dilê xwe î li te ye
Ez bang dikim çima naye.

Avê nalê çi şêli ye
Ê dawestiye çi beli ye
Bençekê ziravê lê ye
Min geregê nini bra ne ye.

Çirbikim dilê min î lêye
Ez nawêrim tu jê ra bêye
Ew yekê pir aksi ye
Ê herî, indî qe neye.

Lê keçikê lê keçikê
Ji min ra naşînî silavekê
Hûn dilî we ji min ra bikin
Şerjêdikim qurbanekê.

Çîyayên me çiqas gir in
Teyr û dû têda difirin
Wê li derinê bîstî bû
Ku heval ji heval dibirin.

Tewim terim wê bibînim
Hûn hevalê min bişînin
Ew pir bi bîrê min ket
Têlek por ji min ra wînin.

Destê min li ser sîngê wê ye
Bi min çi xweş dengê wê ye
Ez çuybûma mala bavê
Min çima nedi wê îngê.

Nu qurukan ser bi berf e
Kew radiwin ref bi ref e
Sîngê gewran wek qutu ye
Tu dibê ku tenbureke ser bi sedef e.

Li ser xênî bulgur tevda
Qaş û birûyan şor wê hevda
Min ê gotina xwe jê ra got
Gewr raketiye ez di revda.

Li ber derî li ber derî
Dayik rûnişt bulxur diherî
Ji lorike xeber tune
Nizanim çi hate serî.

Çav in çav in heval çav in
Çav li serî golek av in
Min go ku bira tu bi
Tu nebusa çavreş zav in.

Li Qulikê li Qulikê
Av reşandin dorê holikê
Ji mi da silav bikin
Wê yarê min ê rindik e.

Konî rindê min li hembere
Pozi royê avitiye sere
Min digot nazliye xwe bibînim
Durzî bavê xwe de ber e.

Ji Suwatonê av qopmîş bû
Li Deveboyne golemiş bû
Keçik û bûk li Deveboyê tev yermîş bûn
Rinda min di nav da parlamîş bû,

www.arsivakurdi.org

ÇEND TEVATUR

berhevkar: Osman Alabay (Curukî)*

1.

Du hevalên derewçîn çûne gundekî û bûne mîvan. Cîran hatine li dorê civîne, hal û xatirê mîvanan pirsîne. Xudanê malê ji wan pirsîye:

- Şunêk hûn jê tên, qê çi heye çi tuneye?

Ji mîvanan yekî gotiye:

- Ez di rê da dihatim, cotkarekî kam (dugan) li ser xermana hêkan digerand. Merivên ku li wir rûnîştî, li çavê hev nêrîne.

Mîvanî din jî gotiye:

- Ez xwe ji xadê nakim, gava ez jî wî ra rawirtim yekî xermana hêkan berba dikir. Ji axzekê da mirîşk derdiketin û ji axzekî da jî dîk direvîn.

2.

Ez sibê zû rabûm ser xwe pîrejinekê bi şujinê ewrê dirîyayî didirût.

3.

Ez sibê zû rabûm ser xwe meriyek li kerê siwar bûye, heştirêk daye hemêza xwe, ketiye rê û teriye.

4.

Kûçik û dîk li ber malê halê hevdu pirsîn; kûçik zûrî got: Axê malê sira xwe ji jina xwe ra got, dikiye bimire.

Dîk gotî: meke ba bimire, ez nukulî xwe li erdê dixim deh mirîşk li dora min digên hev, ez sira xwe ji yekî ra nabêm.

1940î li gundê Tacîre Kurmanca keçikeke gênc, dane mêrî kal. Xatûna Haco li ser xwe, va strana gotiye.

Bayî gênc biya, bayî gênc biya
Ba nole min salê xwe deh û penc biya
Ba şivanê naxirê biya
Ba tirk nebiya, bayî kurmanc biya
Mala Fodul ha li gaz e
Serî xwe girêda çi olfaz e
Mêrî kal derda hatî
Min go xalo, wî go xarzê
Min ardê tirkan dibêto
Mêr e kal derda hato
Go sata pêş min tê çi digoto
Xwîn ser minda kirî mot

MEŞ Û MOZ

Meş heye dengbêj mîna bilbil
Vexwarî avê Kulilk gul
Moz heye bela kir rixe şil
Bin boçênda rexistinê cil.

* Ev tevaturna li aliyê Yunakê hatine berhevkirin.

www.arsiv.org

Bekir Darı

KURTEJİYANA MİN-3(*)

Zikgir, em wanîn derekê min hetenî vê wextê qet nedîtîbû. Ew heywanên ku li wir dijîn giş şiha û azad xayî dikirin. Di serîyê min de pirsek hebû; "Azadî va ye?"

Pêşwazîya me kirin şûn da, bi min ra gotin:

- Hûn ê hetanî êvarê, li nav bêxçe bigerin, bi heywanên din va hev nas bikin. Bi êvarê re li wir maxelên.

Ew tiştên ku me dîtin, qird fotoxrafên wan kişandin. Ez naxwazim şorê dirêj kim. Hûn bi xwe li fotoxrafan mêze kin. Sohbet û yaraniyên ku min bi wan re kir, li hejmara tê, ez ê ji we ra binivîsim. Ya ku ez di pêşî de ji we ra bibêjim, Kêzika rîxê ji kurikê xwe re gotibû.

(*)Beşa yekemin ya vê çîrokê di hejmara 10an de û ya 2an jî di hejmara15an de hatibû çapkirin.



Li wextekê Kêzika rîxê kurikên xwe digerîne û dixwaze ku ma ew dunê nas kin. Bi çengê wan digire û dibêje:

- Mêze kin va çema çiqesî rind e, ava wî çiqes pakij e.

Li vê hêşinîyê binerin ew çi rengekî baş e.



Li va kûlîlkan mêze kin ruhê merî ciwan dibe.

Wan darên ku em di sîya wan de çerx dibin, çiqes şetefatlî ne, ne? Li ser pelgên wan bi hezaran vêz û kurm dijîn.

www.arsivakurdi.org



Cikê, li perikên va çûçikan mêze kin, ev çi rindî ye, yarebî!!

Li vê rîxê mêze kin, ew çi bîhneka mîna mîsk û ember e, ev çi tameka xweş e, wek henguv.



www.arsivakurdi.org

Meri, bi rindiya van heywanan re bibê çi? We dît! Diranên wan, çi dibiriqîne. Lê rîxa wan qet tu feydê xwe ji me ra tuneye, çimkî ew di nav avê de rîxê dikin. Ev çi zirareka mezin e!



www.pakurdi.org

Li rûyê ezman mêze kin, li ewrên gewr, li roya zer. Mîna ku we dît, hertişt pir rind û bi qîmet e.

Ema, tiştê ji hertiştên din bi qîmetir, malê xwe ye!

Min ji malê bahs kir. Mala min nû hate bîre min. Em li bêxçe çerx bûn şûn de hetanî mal çend deqîqe derbas bûn. Ew... Hate zîyareta min bukêteke gul ji min re wanî. Ezî nizanime ku kijan ji wan rind bû, bukêt yan jî ew?

Ê... dibên ku Xwedê dunê di heft rojan de çêkir. Min ew dît bi şûn de. Ji min re weng xayî kir ku;

Ne di heft rojan de

Ne di heft saetan de

Ne di heft deqîqan de

Bi navê Xwedê be ku Wî di heft sanîyan de çêkiriye. Ev heft sanîyên ku min li çavê wî mêze kir, heft dunêyên nû çêbûn û dile min bi heftê parçe bû.



www.arsivakurdi.org

M. Şirindağ

HEYKÎ HEYKÎ

DEVÊ BIHARA SALA 1968 YE. Tîna royê, xwaş dida enîya jinên ku li beroj rûniştî. Ji xwelîyê mîna ewran dû ji erdê dikişîya esmana û li hewa belav dibû. Hilma biharê! Gul û kulîlkan pozê xwe hêdî hêdî ji bin xwelîyê bi derdixistin. Çîyayên paş gund hêşin dikirin. Berxên ji kozê nûberdayî, li dor malan kalekal wûn û dilîstin. Memê, biryara xwe dawû. Ji ber debara dinê, Xanima xwe û çar kurikên biçûk, bi tenê li gund cih bihêle here Alemên.

Çima nere? Çend hevalên xwe çûn û du sê salan bi şûva hatin îzinê. Di bin wana de arebe, bi kincên rind û bi perên pir vegerîyane gund. Mem jî, ji ber debara malê şaş û belaş e. Rokê, me Mem bi rê xist; min çend şîret lê kirin. Min jê ra got "Tu yî, malbata xwe bi tenê li cih dihêlî, tu yî herî welatê xerîb, li wir zimên bievîse, zeneetekî hu bike ku keda te vala nere. Perê xwe qîmetê bizane; ji bo ku tu tim di derîyên xelkê de neşuxilî." Dû ve jî, me ew bi çavên girî bi rê kir.

Mem, li Alemên çend salan şûxilî, bû karker û her heqekî xwe stand. Sala 1970yî hate îzinê. Kinceke bi şûret li xwe kiri wû. Stû bi qirewat, merasî bi boyax û gewr-kal dike. Dilê meriya diketê. Rawûn û rûniştina xwe hatiyê guherînê. Ez bi xwe û xwe ji bo Memê, pir şa û xenê bûm. Min dilê xwe de digot: "Memê xwe xilas kiriye. Ji tuneyîyê bi derket. Ê, ê din malbata xwe jî xilas bike. A pir jî, çû Ewrupe dît û hat; fêdê xwe ê bi civata me jî biwe. Meriyên Ewrupe dîyî pir bûn, civat ê were guherînê."

Pir neçû, ev fikirên min vala derketin. Gundîyên ku dihatin Mem merheba dikirin û xêrhatin lêdikirin, Mem bi kesî ji wana qayîl nediwû. Kê deng dikir, şor nedida kesî. Li ba wî, ewî bi hertiştî dizane. Min mêz dikir; Memê, ji çar qurişa bêtir tiştekî dinî ji Ewrupayê neanîye. Serî li gir bûye. Heşê heyî jî li wir cîh hiştiye û hatiye. Ter-mer Memê, li wir ne ziman hu kiriyê, ne jî bi hunerekê êvisîye. Çûyê neçûye,

www.arsivakurdi.org

ketiye nav dînciyan, nekiriye nexwariye; Memê li vir serî caran nedayî secdê, li wir serî ji nimê heynenaye û li me vegerîyaye.

Min bi qirf ji Hesen Xoce re got:

– Xalê Heso, maşella, Memê yî li Alemên rind kiriye serê xwe. Ne yî bûye xocekî mezin.

Hesen Xoce, ji bo ku yî tim ji xwe bi şik e, tirsa dil da, tim rokê xocek ê were û camîyê ji dest bigire biwe. Reqîb nedixwastin.

Hesen Xoce got:

– Heykî, Heykî. Hella hella, te li kêderê xwendi wû? Memo, muteelê te heye?

Memê ji bawilê xwe pirtûkek mezin bi derxist. Mîna ku kê ew xwandîye tu kêmayîyê xwe yê din tune. Pirtûka li ser dîn ew tenê be. Ew bi cemeetê mêrand û got:

– Min vaya xwand Heskêêê!

Vaya pir neçû xoşa Hesen Xoce:

– Memê tu carekê daweste, got û çerxî min bû,vaya ye ku gawir çûyine hîvê, tu jî tûne (bawer) dikî?

Min jî got:

– Çima tûna nekim? Erê, ez rind bawer dikim. Ne mêrik çûne li hîvê peya bûne.

Hesen Xoce:

– Heykî heykî, hîvê ku tu dibêyî mîna nanekê ye. Ew bênemûsana li wir pêl kin nan?

Memê î pir dizane ya, got:

– Heskê, ew hîv mîv gî derew in. Ewana çûn, çîyayê Ewerestê peya bûn. Dibêne em çûnî hîvê.

Hesen xoce:

– Erê canim, ew rast e, qe ne yê ku herine pêle nexmetî Xwedê ne.

Memê:

– Him jî, vî bi xwe re dermanê mişkan; Eldrîn (Edwîn Aldrîn qest dike) jî birine.

Hesen xoce:

– Ew ji bo çi ye, Memo?

Mem:

–Pê, tu nizanî? Ew dizanin nagêhêne bi Eldrîn, li hewa xwe axû dadine.

Bi ser wê dîaloga Hesê û Memê ve, min saxiya xwe, ji Memê jî kir. Min, dîşliqekî xwe î rind dîwû. Rokê ez rabûm, çûm cem xalê Hes. Min, jê re got;

– Xalê Hes, va lawikê Fatê; Mem î tarê-arê çûye. Lê xwe î alîm dizane. Hay jê ne ku dîn bi şaşî dizane. Ji bo dîn vaya neyî rind e.

– Erê canim, tu were wî wûne rê. Him tu ê pir sewaban bigirêy, him jî tu ê jê xilas wî.

– Erê, meriyekî mîna Memê kê ew anî rê, li ba Xwedê jî pirî meqbûl e.

– Ew duhî ji Alemên hatîye. Ne yek ne dudu, huro li camîyê selayê dixwîne.

Hesen Xoce:

www.arsivakurdi.org

– Erê, gotinên te rast in. Ez ji te pir hez dikim. Em herin cem wî ka çi dixwaze?

Em rabûn çûne cem Memê. Ser sokanê rûniştiwû:

– Aaa, hûn bi xêr hatin, werin xwe bi vir din, got û şûna em rûnin bi me mêrand û em rûniştin.

Min got:

– Memo te li Alemên pir xwendîye. Lê Xalê Hes, bi sala ji te mezintir e. Îlmê te pir e? An jî yê Hesen Xoce?

Dû re Memê got:

– Pê... helbete ilme min hê zêde ye.

Hesen Xoce:

– Hella, hella?

Memê:

– Tabê, helbete wenig e. Min ji te zêdetir xwand.

Ez ketim navbera şora wana. Min got:

– Hûn werin, pirsan ji hevûdu pirs kin. Ka kî ji we pir dizane ew ê bêli biwe.

Bi ser vê gotina min ve Memê got:

– De bê, Heskêê, wexta ku Adem bi Hewayê ve, ji cenetê bi derketin û hatin dinê; çakûç û Ors bi xwe ra anîn? An jî li dinê çêkirin?

Hesen Xoce:

– İii çakûç û ors?... iii nizanim. Dawût pêxember, hesin bi destê xwe xar dikir. ii, çakûç.....?

Xoce di wê pirsê neçû û got:

– Ezî, vê nizanime. De tu bê, Memo.

– Her tiştek, ji Adem hate dinê.

– Pê, pê... serî xwarî ye çi? Memî mino, niha her tiştek ji Adem çêbû?

– Erêê, lê ji ba te ve çi ye, Heskêêê?

– Îîî... vî, serî xwariye canim.

– Serî çima dixwime? Lê ji çi çêbûn, Heskêêê?

– Memo, niha; va tereka, hêvan, nebatana giştik ji Adem bûn?

– Tabêêê ji Adem bûn. Lê, ji ku hatin?

– Lo, Memo, heşê te li serê te ne? An na?

– Erê. Heskêê, heşê min li serê min e. Çi bi heşê min hatiye?

Hesen Xoce hêdî hêdî tiji û xûlî dibû.

– Memo, lo tu vana bi siviq dibêyî?

– Erê Heskêê, ji ba te ve çi ye?

– Pê... Memo, tu nayê bîra min. Qe tê bîra te? Carna, Fata Daka te, qe tereken anîwû dinê?

– Çima Heskê? Bûka Mala Têcikê, wê salê hûyek (yaratik) neanî dinê?

Hesen Xoce: Tuh, rawe rawe! Ne waya yî tarê- arê çûye. Tuh, mala minê. Rawe em herin mal. Ne Memî eqê xwe dixwe.

www.arsivakurdi.org

Yusuf Yeşiloz

Ma gur biçe loqantê

Mêrên gund weke her êvareke zivistanê li mala ciranekî civîbûn. Agirê kerme û kuşkura di sobaya çelik da dişewitî û doralî germ dikir. Çaydan li ser sobeyê bû, aw dikeliya. Mezinê me Kalo çîroka xwe qedandîbû, çavên mêr û zarokan li ser min bûn. Herkesî dizanî ku dora gotinê hatîbû min...

Ez li gundê Kolitan şivanê Mihemed bûm. Keriyê pez hingê bi şev li çolê dima, me ew heta sibê diçerand, bi roj jî em radizan. Em xort bûn, nû zewicîbûn, zarokên me tunebûn, me li mal henek dikirin. Digel min dizanî ku ez ê êvarê biçim çolê, ez bi roj neketim nav nîvinan. Bi ikindîyê re min keriyê pezî ji çarsed mîhan rakir û me devê xwe da çol û banan. Ez li kerê xwe siwar bûm, min kilamên şivantî û yê evînî distiran û hemû dinya ya min bû. Êvarê tarî kete êrde, pez diçêriya. Min sê kevir anin, ew segoşe danîn erde, navbere wan tijî kuşkur kir, agir berdayê û çaydanê xwe da ser.

Pez bêdeng diçêriya, bi tenê dengê zengilan dihat. Min bi hemd û dem şîva xwe xwar, çay vexwar. Zikê kûçik jî min bi yala ji ard û avê têr kir. Jina min we rojê ji min re av germ kiribû, min xwe teze şuşti bû û min xwe mîna pariyek kaxiz sivik his dikir. Mixabin ez û kûçik li kêleka agir bi xew da çûn.

Wexta ku ez nîviyê şevê şîyar bûm, ez çi bibînim? Kûçikê minî ku min êvarê goşt dabûyê bê xem li kêleka min razaye, keriyê pez jî tune. Min bi hêrs bi darê xwe kûçik kuta, qîreqîr û awaza wî dinya girt. Ez heta berbanga sibê li pez geriyam, lê mixabin bêserkeftin. Meriv bigota; erd qelişiye û pezê min ketiyê. Piştî şefaqê ji aliyê gund de deng hatin.

Ez bi lez bi wî alî da çûm. Tirs li pişt min bû, gavên min mîna yê gurakî bûn. Ey bezîm. Heta demekê nêzik deng ketin guhê min, navê min tînan ziman. Min ji xwe re got: "he şukur, keriyê pez çûye gund. Paşingê dengê jina Mihemed, Safe, mîna derzîyê kete guhê min: "Husên! Husên! Xwedê mala te bişewitîne, tu ji xortaniya xwe qet xêrê nebînî!" Ey tirsiyam. Ew îşareta

www.arsivakurd.org

bûyeraka pir xirab bû. Ji aliyê din jî min got: "Birikê Safe pir zirav in. Heye ko tu tiştên xirab çênebûne."

Her ez nêzikî gund dibûm, dengê hawar û giriyê jinên gund zêde dibû. Êdî min gotin û qîrîn ji hev kirin der: qeflekî guran ketiye nav keriyê pez û gelek mîh telef kirine. Mîhên bermayî bi serê xwe çûne gund. Dema ku ez gîhiştim mêr û jinên ku tof bûyî, her yekî gotinên giran mîna kevira avêtin ser min. Hin kesan digotin: "Husên, Xwedê ejnûyê te û yên kûçik hûr bike!" Hin kesên din jî digotin: "Husên, mala te bişewite! We herduyan nan û goşt xwar û li tenişta wan bi xew de çûn! Fedî bike!"

Zimanê min bi benekî sicim hatibû girêdan, deng ji min nedihat der. Sayke çokên min şikestî bûn. Gurên xopan çil mîh telef kirîbûn, şêst mîh ji wenda bûn. Min nifirê giran li xwe dikirin. Safe bi eslê xwe ne devpîs bû, lê wê rojê kufir mîna gule ji devê wê dihatin der. Min carekê ceriband ku bigrîm, histêran bînim der û bi vê yekê hêvîdar bûm ku dilê Safe bi min bişewite û ew jina dev ji nifir û seban berde. Feyde nekir. Paşingê Mihemed bi çend mêrên gundê simbêlqeytan hat û wan ji dûr de bang kirin ku mîhên wendabûyî hatina dîtin. Em hindik dilfireh bûn. Li gund herkes li ser ninga bû, zarok û kal. Mihemed însanekî aşitîperwer bû, lê wî jî li hember min dest bi tawanbariyê kir. Gotinên wî wek şûr diketin dilê meriv. Jinikêk mezin – navê wê îro nayê bîra min – bi destê Mihemed girt û got ku ma ew dua bike, Xwedê zar û malbata wî biparêze. "Malê dinyayê wek qilêra desta ye" jinikê got, "Îro heye, sibê tuneye." Bi ser wan gotinan de Safe hindik rehet bû, lê Mihemed sebên ku min qet caran ji wî nebîhistîbûn anîn ziman.

